

# HAWAR a nû

Hizrî - Ramyarî - Rewşenbîrî

Kombenda Kawa Bo Çanda Kurdî Derdixe

Çavdêrê Giştî

***Selah Bedredîn***

Desteka Nivîskara

***Drê Birahîm Mehmûd***

***Ebdilxaliq Sersam***

***Vedan Adem***

Şiretkarên Nivîskara

***Drê Mihemed Ezîz Zaza***

***Ferde Cemîl Paşa***

***Foad Gemo***

**Derhênana Hunerî**

*Îsam Heç Tahir*

**Çapa Elektronikî**

*N. Zaza*

---

## **Naverok**

---

<b>Di bîranina 108 salya rojnamegeriya kurdistanê</b>	<b>SERGOTAR</b>	<b>118</b>
<b>Karîgeriya mîr Celadet Bedirxan û kovara HAWARli başûrê Kurdistanê</b>	<b>Mûsedeq Tovî</b>	<b>116</b>
<b>MEDYA Û BERNAMEVNÎ DÎKSIYON ( XWEŞAXAFTÎN )</b>	<b>Deniz Dargul</b>	<b>102</b>
<b>Destpêkên Peydabûna Hesta Netewayetî Kurdî di Mêjoya Nû de</b>	<b>Besam Mistefa</b>	<b>90</b>

**Çewaniya Firotna Kovara Hawar nû :**  
**Pişkdarî jibo yek sal**  
**Dezgehên Hukmetê û mirî û Sendike (15000 ) Dînar**  
**Kesan ( 12000 ) Dînar**  
**Pişkdarî jibo Şeş Heyv:**  
**Dezgehên Hukmetê û mirî û Sendike (7500 ) Dînar**  
**Kesan ( 6000 ) Dînar**  
**Jibo bêtir pêzanîn peywendiyê Bi Kombenda Kawa bo**  
**Çanda Kurdî bike**

**Hewlêr - Şoreş - Cada Selahedîn Tel : 2240441 - 2242843**

[binkeykawa@hevgitin.net](mailto:binkeykawa@hevgitin.net)

[www.hevgitin.net](http://www.hevgitin.net)

## Di bîranina 108 salya rojnamegeriya kurdistanê

---

Ji dest pêka peyda bûna hesta netewî ya kurdayetî û dariştina wî bi şewekî şaristanî ku pitire ji sedsalî bi yekem rojname bi navê Kuridstan, eve yekem pêngav bû di meşa bizava rizgarîxwaza kurdistanî de û meşa rojnamegerî û ragihandina kurdistanî de ya ku mîr Mekdad Midihet Bedirxan vekirina wê ya yekemîn kir.

Derketina rojinama Kuridstanya ku tê nîyasîn bi nexiriya rojnamegerî û ragihandina kurdistanî dengê bû ji dest pê kirina qonaxeke nû ku heta niha di mêjûyê xebata gelê kurdistanê de berdewam, derketina vê rojinamê alîkariyeke mezin bû ji bû berferh bûn û belav bûn û kûr kirina hestên netewî li cem gelê Kurdistan û agihdar bûnê li ser astê kurdistanî û navnetewî, di heman dem de xwiya kir ku kurd ewe en têne hijmartin ji resentiirîn gelê rojihilata navîn û gelkeî xwedî şaristaniye û dikarê rola xwe di pêşketin û xwe guncandinê li gel yên din li ser astê cîhanê bi giştî bibîne, herwisa da xwiya kirin ku gelê kurd tenê berê xwe dide azadiya xwe û serxwebûna xwe û wekî hemî gelan jîyaneki bi rûmet di welatê xwe de dixwaze û xwedî mafe di hîlbijartina rêvebirina kar û barên xwe bi regekî serxweyî dûrî layenên dîtir.

Saxkirina bîranîna 108e mîn belav bûna rojinama Kurdistan ji me

dixwaze îro pêdaçuneke giştî bi astê karîgerî û saloxetên rojnamevanî û ragihandina Kurdistanê de bikin, û pêdiviye ev pêdaçûne li dûv qonaxên demê û rûdana were dabeş kirin ewe en di destpêka sedasaliya borî de bi renekî giştî û li domahiya sedsala borî bi taybetî rûdane, ji ber ku pitirîya rûdanên Kurdistanê – bi taybetî başûrê Kurdistan- lewma ev parçe rû birwê gelek bûyerên diltezîn ku nimûnên wê di cîhanê de kêmin lewma ji wî şerê ku hikumeta Îraqa dektator li ser serê şoreşgera û siyaseta qirkirinê û komkujiyên di nav sivîlan de ta ku digihe bi karîna çekên kîmwî li hemberî kesên bê suc û sivîlm û koça meliyonî ta ku rapêna gelê Kurdistan di sala 1991 de û piştî rizgarî bûna piraniya deverên başûrê Kurdistanê û damezirandina yekemîn perlemanê hikumeta Kurdistanê û revebiriya kurdan ji karên xwe re û herêmên xwe re bi renekî şaristanî û dimokirasî. Gelo rojnamegeriya Kurdistanê bi wê rola xwe rabû beramber van bûyeran?

Gelo rojnamegerî û ragihandinê rolên xwe baş pêk anîn beramberî doza gelê Kurdistanê û wan pêşketinên ku di meşa 15 salên derbas bûy de û ta roja îro ji aliyê ve û ark û karên pêşerojê ji aliyê din ve.

Di nava li hevketin zêde bûyeran û berjewendiyên navnetewî û herêmî û rola berçav ya rojnamegerî û ragihandinê de li ser asta raya giştî û arastekirina siyaseta û hêzên mezin di cîhanê de, roj bi roj pêdiviya gelê Kurdistanê û doza Kurdî zêde dibe bi rojnamegriyê azad û ragihandineke netewî ku wekî wê pêdiviye bi îstîratîjîyeke siyasî, netewî û aborî.

# Karîgeriya mîr Celadet Bedirxan û kovara HAWAR li başûrê Kurdistanê

Mûsedeq Tovî -Dihok

Mîr Celadet Bedirxan, tîpên latînî yên zimanê kurdî, kovarên hawar û ronahî, kitêbxana hawarê çend, navekên diyarên dîroka rizgarîxwaza kurdî û rewşenbîrî û rojnamevaniya kurdî ne di sed saliya bîstêda, her yek ji van navan giringiya xo, rengivedana xo û karîgeriya xo divê qonaxêda heye... Mîr Celadet hêmayekê pêncî salên xebata sasî û rewşenbîriya kurdî ye di nîva yekê ya sed saliya bîstêda, tîpên latînî yên mîr Celadetî despêka qonaxeka nûye di dîroka ziman û rewşenbîriya kurdî da, ev tîpe berihemê mandûbûn û dîvçûn û vekolîna mîrCeladetî ya (13)ê salane û li ((15)ê)ê golana ((1932)ê)ê bi derçûna kovara hawar ketine diwarê pê xwandin û nivîsînê da, berî wan û piştî wan jî çend bizav bo danana şêwazekê dî yê tîpên latînî yên kurdî hatîne kirin belê çî ji wan nekarîne cihê tîpên latînî yên mîr Celadetî bigirin û ev tîpe bûyine tîpên serekî yên xwandin û nivîsîna kurdî li cem pişkeka mezin jî gelê kurd.

Her bi vî rengî kovarên hawar, û ronahî, û pertûkên kitêbxana hawar ne tinê yekemîn berihemên kurdîne yên bi van tîpan hatîne

çapkirin, belkî jêderên dewlemendên ziman û rewşenbîriya kurdîne û ji despêka sed saliya sîhan ve bi hizaran kurd di rêka wan ra fêrî xwandin û nivîsîna kurdî bûyine û li dîrok û rewşenbîriya kurdî aşnabûyine û heta îro bi sedan babet û vekolîn li ser hatîne nivîsin û bûyine babetê çendîn nameyên xwandinên bilind.

Kurt û kirmancî mîr Celadet û berihemên xo şorşek rewşenbîrî bûn, ev şorşe berdewamiya şorşên netewayetyên gelê kurd bû. di sed saliya nuzdê û bîstêda

Mîr Celadetî piştî ezmûn û serbûreka dirêj û berihevîyeka baş li ((15)ê)ê gulana ((1932)ê)ê bi belavkirina yekemîn hijmara kovara (hawar)ê û dane niyasîna tîpên latînî yên kurdî bo yekemîn car dest bi vê şorşa rewşenbîrî kir û di demekê kurtda tîşkên vê şorşa rewşenbîrî sinûrên deskirdên navbera parçên Kurdistanê şkandin û seranserî Kurdistan vegirt.

Dibît pirsîyarek bête kirin gelo çima ev karê mîr Celadet Bedirxanî bi şoriş hatî ye navkirin..? Di bersivêda dê bêjîn:

Şoriş guhirîne ji qonaxekê bo qonaxeka

baştir, ev karê mîr Celadetî jî şorşek bû belê şorşek rewşenbîrî, çinku piştî bi dawî hatina şerê cîhanyê êkê û dabeşkirina Kurdistanê li ser çîwar dewletên dagîriker û piştî Kemal Etaturikî komara turikiya damezirandî li seranserî bakurê Kurdistanê û turikiya ne tinê yek peyva kurdî nehatibû çapkirin û belavkirin belkî peyvîn bi zimanê kurdî qedexebû. Li rojihelat û rojavayê Kurdistanê û devera badînan ya başûrê Kurdistanê kawdan her nêzîkî vî rengî bû.

Tinê li parêzgehên Silêmanyê û Kerkûk û hewlêrê li hindek xwandingehên seretayî zimanê kurdî dihate xwandin û li van bajêran û li bexda bi rengekê berteng hindek çapemenyên kurdî derdiketin.

Divî demîda mîr Celadet Bedirxan dest bi şorşa xo ya rewşenbîrî kir, demê li (15)ê gulana(1932)ê kovara (hawar)ê bi tîpên latînî li şamê paytextê sûriyê belavkirî, bi kovara ronahî (şam 1942 -1945)ê û pertûkên kitêbxana hawarê û rojnama (rojanû) bîrût (1943 -1945)ê û rojnama (stêr)ê (1943 -1945)ê yên mîr kamîran Bedirxan berdewamî bi vê şoreşê hate dan «texeka xwandevanên kurdî bi tîpên latînî û nivîskarên kurd peyda bûn, biniwaşek bi hêz bo rewşenbîriya kurdî li vê parçê hate danan, sereray hindê ku ji nîva duwê ya salên çilan ve û piştî ku regez perstên ereb li sûriyê destelat girtî ye dest hemû çalakyên rewşenbîrî û çapkiryên kurdî li sûriyê hatine qedexekirin ev biniwaşek hindê bi hêz û karîger bû her delîveka bo kurdên vî welatî helkeftî li ser vî biniyatî ya dest bi çapkirin û weşana berihemên kurdî kirî û ji salên heştêyan û paştir serihildanek

rewşenbîriya kurdî li sûriyê despêkirî ye û biniyatê wê heman şorşa mîr Celadet Bedirxan ye.

Hindî peywendî bi bakurê Kurdistanê ve hey ku pişka mezina Kurdistanê ye, ev şorşa rewşenbîriya mîr Celadetî li şamê despêkirî zincîreka bizava rewşenbîriya kurdî bû ewa despêka sed saliya bîstê li estembola paytextê Usmanî despêkirî herwesan berdewamiya şorşên netewa yetyên kurdî yên bakurê Kurdistanê bû, helgirên xetîrên berahyê yên ve şorşa rewşenbîrî mîr Celadet û hevalên wî heman ew şurşgêre bûn yên li bakurê Kurdistanê pişkdarî di şorşên çekdarîda kirî û piştî şkestina wan şorşan mişext bûyine rojavayê Kurdistanê û sûriyê li şamê akincî bûyin û gelek ji wan gehiştine wê baweriyê ku nikarin dwî serdemîda bi şorşên çekdarî bakurê Kurdistanê rizgar biken, lewman jî dest bi vê şorşa rewşenbîrî kirî ye û ev şorşe jî pitir ji her parçeka dî ya araste kirî bû bo bakurê Kurdistanê.

Li dûyiv kawdanê dwî serdemîda bakurê Kurdistanê têda dijiya û rijêma turikiya bi agir û asnî hukim lêdikir ne tinê çapkir yên kurdî û xwandina kurdî belkî dwî serdemîda û heta berî çend salekan axiftin bi kurdî û xo bi kurd dane niyasîn li dwîv yasayên turikî gunehên mezin bûn û sizayên dijwar li ser dihatine dan.

Jêderên berdest diyarinaken kanê wî serdemî kovar û çapkiryên mîr Celadetî digehiştine bakurê Kurdistanê û turikiya yan ne, eger digehiştin çawan digehiştin û belavedbûn..? Belê ya xoya û diyar ew e vê şorşa rewşenbîrî karîgeriyek giring li bakurê

Kurdistanê kirî ye û ji sala ((1932)ê)ê ve heta evro her bizavek rewşenbîrî li bakurê Kurdistanê û turikiya hatibît kirin yan revendên wê parçê li der vey welatî kiribît li ser wî biniyatî hatî ye kirin yê mîr Celadetî li sala ((1932)ê)ê danay û her berhemekî bi kurdî belavkiribît bi tîpên latînî yên mîr Celadetî çapkîrî ye. Bo nimune em dikarîn amaje bi kovara dengî kurd, urgana lawên kurd li ewropa bikeyin ku ji Aliyê kurdên bakurê Kurdistanê li ewropa hatî ye belavkirin û kovara (dicle û Firat) ku heşt hijmar li salên (1962 -1963)ê li estembolê hatîne belavkirin û kovara (deng) ku li sala (1963)ê du hijmar li estembolê lê hatîne belavkirin,

(1) wek despêk bo bizavên rewşenbîrî û rojnamevanî yên kurdên bakurê Kurdistanê ku bi tîpên latînî yên mîr Celadetî hatîne belavkirin.

Herwesana di van deh bîst salên dawiyêda jî serihildanek rewşenbîrî û rojnamevanî li seranserî bakurê Kurdistanê û turikiya û revendên vê parçê li ewropa peyda bûye û gehîştî ye astê vekirina xulên fêrikirina xwandin û nivîsîna kurdî hemû li ser wî biniyatî yê mîr Celadetî li sala ((1932)ê)ê danay û bi heman wan tîpên latînî.

Hindî peywendî bi basûrê Kurdistanê û kurdên îeraqê ve hey kawdan di vî serdemîda li vê parçê pitir ji parçên di yên Kurdistanê bo ziman û rewşenbîriya yê harîkar bû, li hindek cihan li qonaxa seretayî xwandin bi zimanê kurdî bû, rê li ber hindek çapkiryên kurdî ya vekirîbû, komeka nivîskar û rewşenbîrên kurd di vî warîda kar dikir, lewma her zwî mîr

Celadet û berihemên wî û tîpên wî yên latînî cihê xu li vê parça welatî kir, berihemên nivîskarên vê parçê di kovara (hawar)ê da hatine belavkirin, naverokê (hawar)ê û tîpên latînî yên mîr Celadetî serinica rewşenbîrên vê parça Kurdistanê rakêşa û hindekan dest bi fêrbûn û bikaranîna van tîpan kir.

Li vêrê dibît pirsiyarek bête kirin erê mîr Celadetî berî ((15)ê)ê gulana ((1932)ê)ê têkeli û peywendî digel rewşenbîrên basûrê Kurdistanê hebûne..? Ku husana zû bi berfirehî (hawar) gehandî ye vê parça welatî û ji hijmar sê ya kovara (hawar) ve dest bi belavkirina berihemên nivîskarên vê parça Kurdistanê kirî ye û di (22)ê hijmarên berahyê yên vê kovarêda (26)ê berihemên nivîskarên basûrê Kurdistanê têda hene.

(2)Bo bersiva vê pirsiyarê pêdivî kurte pêdaçûnekê ye bi jîyan û çalakyên mîr Celadetî da bikeyin.

Mîr Celadet Bedirxan li (26)ê nîsana (1893)ê li estembolê hatî ye ser diniyayê, wî çaxî malbata wan ji Aliyê

dewleta Usmanîvehatibûne dwîr êxistin û li vî bajêrî dijîyan,

(3) vê malbatê di nav navendên rewşenbîrî û netewayetyên kurda sengek mezin hebû, wî serdemê estembol navenda kesayetî û rewşenbîr û navdarên kurdên hemû Kurdistanê bû ji wan kurdên basûrê Kurdistanê, ji sala (1908)ê ve mîr Celadet wek kesatiyek û rewşenbîrek kurd hatî ye niyasîn,

(4) goman têda nîne divê qonaxêda peywendî digel kurdên basûrê Kurdistanê hebûne.

Piştî şerê cihanyê êkê digel bab û Mamên xoe pişkdarî di damezirandina komela rêkxistinên civakiyên kurdî da kirî ye, li sala (1919)ê digel mîr kamîran Bedîrxan û Ekrem Cemîl paşa û fayq tufiq xelkê Silêmanyê û efserê îngilîzî mîcer niwîl bo zanîna daxazên gelê kurd geştek di bakurê Kurdistanêda kirî ye.

(5)Herwekî me amaje pêkirî divê qonaxêda estemol navenda xirive bûna kesayetî û rewşenbîrên hemû Kurdistanê bûye, goman têda nîne di encamê bi hevra karkirinê mîr Celadetî têkelî û peywendî digel rewşenbîrên basûrê Kurdistanê hebûne û ev peywendî ye piştî zivirîneva wan bo îraqê di berdewam bûne.

Li sala (1921)ê destelatê turikiya kete dest Kemal Etaturkî û dewleta turikiya hate ragehandin û dest bi girtin û kuştina welatparêzên kurd hate kirin, mîr Celadet wek piraniya malbata xo mişext dibît, jiyana xu li elmaniya û misrê û lubnanê di burînit, li (5 - 1- 1927)ê li bajêrê (bihimdu) ê lubnanê pişkdayê di damezirandina civata (xwîbûn)ê da diket û wek yekemîn serokê (xwîbûn)ê dihête helbijartin.

(6)Li vêrê qonaxek nû dijiyana mîr Celadet û peywendiyên wî digel kurdên basûrê Kurdistanê despêdket. Sinurê karê (xwîbûn)ê wek partek yan civateka siyasiya kurdî seranserî Kurdistan bû, lewma her zû liqên wê li parçên dî yên Kurdistanê hatine vekirin,

Li dwîv belgenaman liqekê mezinê (xwîbûn)ê li çiriya êkê (1928)ê li Silêmanyê hebû, hijmareka rewşenbîrên kurdperwer têda endam bûn.

(7)Mîr Celadet wek serukê (xwîbûn)ê di navbera (1927 -(1932)ê)ê da mijilî serperştiya rêkxistinên (xwîbûn)ê bûye, (8) goman têda nîne di encamê van peywendiyên rêkxistinêda dê peywendiyên wî bi her rengekê hebît digel rewşenbîrên ser bi rêkxistinî xuve hebin û dê agehdarî kawdanê siyasî û rewşenbîrîyê wan deveran bît yên wan rêkxistin lê heyin.

Li vêrê em dikarin amaje bi belgenameka wezaretê der ve ya berîtanî bikeyin ku diyaştina mekêda Celadet Bedîrxan bi navê kumîta navîna (xwîbûn)ê bo komela netewan li cinîv li (17)ê nîsana (1931)ê piştevaniya (xwîbun)ê bo daxazên tewfiq Wehbî begî diyardket yên ji komela netewan û kumusiyona bilind întîdabê li dor mafên gelê kurd li îraqê kirîn.

(9)Eve bixwe nîşana peywendiyên bi hêzên mîr Celadetî ye digel kurdên îraqê û agehdariya wî ye li ser kawdanê wan. Ji aliyekê dîve piştî mîr Celadet di encamê pişkdayê di şorşa agirî da li sala (1930)ê mişextî îranê dibît paştir şahê îranê wî destê serikirî dihinêrîte îraqê, li îraqê jî destelatdarên îngilîz berpên wî teng diken wî naçar diken bilez vegeŕteve suryê.

(10)Belê li vêrê diyar nîne kanê mîr Celadet çend li îraqê maye, kanê peywendiyek digel rewşenbîrên kurdên îraqê kirî ye yan ne.

Di encamê vê pêdaçûnêda em dikarin bêjîn mîr Celadetî çî wek kesatiyek ji malbata rewşenbîr û kurdperwer, çî wek serukê parteka netewayetî, çî di encamê geşt û geriyan û mişextiya wî li çendîn bajêr û welatên cuda çendîn rengên peywendiyên digel kesayetî û



rewşenbîrên basûrê Kurdistanê hebûne û ev peywendî ye jî bûne eger her zû kovara (hawar) bi berfirehî gehiştî ye rewşenbîrên kurdên îeraqê û her di hijmarên berahyê yên kovarê van rewşenbîran pişkdariyek xurt di berperên wê da kirî ye. Û çespondina peyva (kovar)ê ji hijmar pêniçê kovarêve ku heta hijmar çiwarkomel bi anku ya (Alimcle) ya erebî di hate bikar anîn berihemî vê peywendî û pişkdaryê ye.

Bo pitir selmandina van peywendiyên de amaje bi du ji van peywendiyên keyin:

Di namekêda ya mîr Celadetî bo hisên huznî mukiriyânî hinartî li (3)ê tîrmeha ((1932)ê)ê , anku di heman rojida ya hijmar (4)ê ya kovara (hawar) deriketî diyar dibît ku berî vê rojê bi (13)ê salan anku dinavbera (1919-1920)ê digel mukiriyânî gehiştîne hev û divê dîdarêda derbarey rewşenbîriya kurdî û belavkirina rojnameka kurdî peyvîne û divê namêda diyar dibît ku name guhirîn dinavbera wanda hebûye û wî serdemî mîr Celadet agehdarî kovara (zarêkirmancî) bûye ku di wî serdemîda ya rawesitîyay bû û mukiriyânî ser jinû berihewî bo dubare belavkirina wê dikirin, di hijmarên paştir yên (hawar) êda amaje bi vê çendê hatî ye kirin.

(11) her divê namêda mîr Celadetî daxaz ji mukiriyânî kirî ye navunîşanên wan kesan bo bihnêrît yên (hawar) divêt dabo bihnêrît.

(12) Herwesên berî belavkirina (hawar) ê mîr Celadetî digel zanayê navdar (tewfîq Wehbî) peywendî hebûne û dîdarîkirîne û berî ((15)ê)ê gulana ((1932)ê)ê bi du salan herwekî mîr Celadet dibêjît pêrar li şamê hevdu dîtî ye...

û her dûyan tîpên xo yê latînî wî çaxî tufîq Wehbî jî hindêk tîpên latînî bo zimanê kurdî berihewkiribûn hevberîkirîne û mîr Celadetî viyaye her du tîpan bigehînin hev û yek şewaz tîpên nû û hevgerî jê bibijêrin û belavbken, belê herwekî diyar tufîq Wehbî li dîv vê çendê nehatî ye û gîru bûna belavbûna (hawar) ê her bo vê çendê dizivirîte ve, çinku mîr Celadetî li (16)ê çiriya êkê (1931)ê moleta wê wergirtî ye û berihewyên çapkirina wê li şubata ((1932)ê)ê bi dawî hatîne, belê bi hîviya bersivên tufîq Wehbî belavkirina (hawar) ê heta ((15)ê)ê gulana ((1932)ê)ê vekêşaye.

(13) Di vê pêdaçûnêda diyar dibît peywendiyên mîr Celadet Bedirxanî digel xelkê basûrê Kurdistanê nemaze rewşenbîran di astekîda bûne ne tinê zû kovar gehandî ye wan belkî di demekê kurtda berihemên hijmareka zor ji nivîskarên navdarên basûrê Kurdistanê gehiştîne (hawar) ê û li ser berperên wê belavbûyine.

Pêdivî ye bêjîn egerekê dî yê harîkar bo vê çendê ew bû, diwê salêda ku (hawar) deriketî rojnamevaniya kurdî li îeraqê di kawdanekê lawaz da bû, kovara (zarêkirmancî) (adara 1926 -temuza (1932)ê)ê ya rawesitîyay bû,

(14) take rojname kurdî (jiyan) ya heftane ku li Silêmanyê dihate belavkirin di encamê kawdanê siyasî bi taybet raperînî ber derikî seray Silêmanî li eylula (1930)ê pitir pwîte di da babetên edebî û civakî.

((15)ê)ê lewman (hawar) dibîte sekoyek û rewşenbîrên kurdên başur lê komirbin û berihemên xo yê derbirînê ji hestawan ya netewayetî diken têda belavdken.

Herwesan navdariya mîr Celadet û malbata wî bi kurdperwerî şorşgêryê fakterekê dî yê xirive bûna rewşenbîrên başur bû li mîr Celadetî û kovara (hawar), ku berê xo di da mîr Celadetî wek serikirdekê cihê hîvî û omêdan, eve jî di çendîn babetanda diyar dibît yên ev rewşenbîre têda pesna mîr Celadetî û malbata wî diken.

Hamid ferec yekem rewşenbîrê kurdê başure yê bi nameka pîrûzbayyê pişkdaryê di hijmar (3)êya (hawar)ê da diket û bi navê gişt lawên kurdên îraqê ve di pîrûzbayiya (hawar)êda: dibêjît

le paş dest guşîn. Demêk bû çawerwanî stêreyekî gelawêjî kurdman derikird. Taku diwênê beçawî xoman dîman ke ewîş kovarî (hawar) e ke çawî hemû kurdêkî ronikirdewe, hîwaman waye ku yetînî pirîşkî gişt Kurdistan ronak katewe û hemû kurdêk bedem em haware û biçê tabkewîne ser rêgay û bo yekiyetî kurdan hewil bideyn.

(16) (hawar) li cem şakir fetahî şehîd di çavên hemû kurdanda tête xwandin, dengê Nalîna lê qewmayên kurd e, gaziya goristanên nemrên kurdên eyubî û Bedirxaniyane, heta dibêjît:

hawar Nemamêke be destêkî zana lezewî yekî bi pîta nêjirdawe, belam bo emey berubûm bida debê çawdêrî bikirê ta gewire debê...

Paştir ev şehîde nemire hawara xo dibete ber gişt kurdan yên paredar, nivîskar, zana û xwandevan xo li hawarê bikene xudan çunkî em kovare her pîtey (qiseyey) be desitî yekêkî zana û têgeyiştû nûsirawetewe, her qisey ledlêk hatûte derewe, benaskî wek perey goll,

beqayîmî (bo parastinî xuşewîsitî kurd) wek sinuqî pola weha ye, her bîrey le mêşkî yekêk hatûte derewe, kurd û Kurdistan wek heykelêkî gewire û billnd hemîşe li pêş çawya ye, le xewda bewewe xerîke lebêdarîşda her bewewe xerîke... (17) Her bi vî reng mîr Celadet û kovara (hawar) bûyine îlham beşên şairên basûrê Kurdistanê, helbest bi helketa derçûna (hawar) ê vehandîne, ji wana (Mamosta) navek li (28)ê hizîrana ((1932)ê)ê di besna (hawar) êda dibêjît

Herdem bedemî hawar pêk de kuşîş û hawar  
Huşiyar debin kurdan ladeben şîna wilat  
Ez guriya bangê teme.

(18) Şairekî dî yê şarezurî bi navekê xwaziraw ayfîn di pesna mîr Celadet û malbata wî da û royê wan di bizava rizgarîxwazî û rewşenbîriya kurdîda dibêjît:

Emîrî muhterem ey fexirî millet mîr Celadet  
beg

Newey mîrî cizîr û qehremanî mulkî Botanî  
Berastî xanedannan layîqî teizîm witebcîmlê  
Le ser kurd lazime daym bika erzî  
pefaxwafî

Lenaw qelliy hemû lawêkî kurd em şêre  
nûsirawe

Keşayestey supas û şukire famîliyay  
Bedirxanî

(19) Gencekê kurd bi navê (lawêkî kurd Ewnî) li 24/ kanûna diwê (1933)ê ji bajêre kuyê ve di dastan e helebstekêda Bedirxaniyan bi helgirên rêbaza netewayetî û xudan dîroka pîr qurbanîdan û serfîraziya kurdan û cihê hîvî û umêda kurdan di rizgarî û serbexoyêda di danît û di dawiya helbestêda dibêjît:

Ewî duşmin be kurdane hîlakî jehrî mariyan key

Xuda ew qewme nazidar e ke hefzî çawezariyan key

Le diniya şad û xendan û bilind û bextiariyan key

Xudayaka meran serfiraz û payedariyan key

Newey şêran kurdan yenî xêzanî Bedirxanî

(20) Kurdên başur bi vî rengî pêşiwaziya mîr cediladet û kovara (hawar) kir, ew kovara wek di. Kemal mezher dibêjît:

Hawar take kovara kurdî bû di sê salên berahyê yê jyê xoda mîna şemalikê di tarî şeva nezanyê da disut.

û ronahî di da çîwar kinarên xo

(21) Bi vê çendê (hawar) wek mînbereka azad bû, çaktirîn rewşenbîrên basûrê Kurdistanê berihemên xo yê şorşgêrî û netewayetî têda belavdkirin, ew berihemên dwî serdemîda ew nedikarîn li îraqê belav biken. Derbarey vê çendê. Kemal mezher dibêjît:

Dergey hawar bo jimareyek nûser û şayirî benawbangî kurdî îraq dekirêtewe û beşêkiyan bo yekem car li ser laperekanî hawar beriheme be nawibangekanî xoyan bilawkirdotewe û ew e bo te handerêkî niwê bo geşepêkirdinî edebî hawçerxî kurdî îraqî.

(22) Ji wan berihemên kurdên başur yê bo yekem car di (hawar) da belavbûyin yan ji egerên siyasî di şiyanda nebû dwî serdemîda li îraqê bête belavkirin em dikarîn amaje bi hindekan ji wan bikeyin:

Helbesta (wefdî Kurdistan) ya Pîremêrdê nemir bi raperîna berderikî seday Silêmanî eylula 0391 gutî û egerên danana helbestê di

kovarêda hafîne diyarikirin ku Pîremêrd têda dibêjît:

Wefdî Kurdistan weten firoşan

Herze wekîlî şarî xamoşan..

(23) Helbesta sinûr ya şayir Ebdulxaliq epîrî ku têda dibêjît:

Kurd e dezanî le ku cêgire xizmanî to

Gû bigire bo tî billêm cêge xêlay to

Kêwî gurus û umqî hewzî eskenderun

Xerbî ta behrî reş sinûrî meydanî to

(24) Helbesta (yadî weten) ya şayirê mezin bêkes, helbesta (sikalayek li girdî seywan) ya şayirêkê dî bi navê (Hêmin), peşana (le Kurdistanê xwênîn), helbesta (bo xawenî hawar)

û çendîn berihemên dî yê kurdên başur giruvê vê rastyê ne.

—(25) Layenekê dî yê karîgeriya mîr Celadetî û kovara (hawar) li basûrê Kurdistanê babetê zimanê kurdî û diyalîktên zimanê kurdî û şewazên ji hevnezik kirina vam diyalîktan û peyda kirina zimanekê yekgirtî bû.

Bê goman despêka edebiyata kurdî bi helbestê dest pêkirî ye û helbesta kurdî û paştir hindek rengên dî yê edebî bi hemû diyalîktên kurdî hafîne nivîsîn. Belê digel despêka peyda bûna rojnamevaniya kurdî li 22 nîsana 1898 ê bi taybet despêka rojnameviya kurdî ya estembolê li sala 1908 û paştir jî anku di qonaxa navbera 1908 -1920 her du şewe zimanên serekyên kurdî kirmanciya bakur û başur wek şewe zimanên edebî û rojnamevanyên kurdî diyarbûn, divê qonaxêda jî hindek caran hizir li zimanekî edebî yekgirtî

dihate kirin.

Belê piştî şerê cîhanyê êkê û damezirandina komarê turikiya û girtina hemû delîve û dergehên belavkirina ziman û rewşenbîriya kurdî li bakurê Kurdistanê û turikiya bizavên rewşenbîrî û rojnamevanyên kurdî li basûrê Kurdistanê û îraqê despêkirineve, her çend e ev despêke dizivirîte ve sala 4191 û belavbûna kovara (bangî kurd) li bexda li sala 1917 belavbûna rojnama(têgeyiştinî rastî) her li bexda.

(26) Ev qonaxe di dîroka rojnamevaniya kurdî û çapemenyên kurdîda qonaxek nû bû, gişt nivîskarên vê qonaxê yên başur bûn û diyalêkta wan kirmanciya başur bû, nekesekî hizir li diyalîktên dîtir û ne li zimanekê yekgirtî dikir. Belê bi belavbûna kovara (hawar) li (15)ê gulana (1932)ê û gehiştina hijmarên wê bo îraqê, li serberperên vê kovarê babetê zimanê yekgirtî û li yeknêzikirina diyalîktên kurdî hate vekirin.

Hamîd ferec wek yekem nivîskarê basûrê Kurdistanê pişkdaryê di hijmara( 3)êya (hawar)ê da diket û piştî pîroziya (hawar) ê bi navê gişt genicên kurdên îraqê daxaza bizavên yekgirina diyalîktên kurdî ji (hawar) ê diket:

reca ekeyin lemewdwa hewll biden bo tewihîdî lehcat ta weku hemû kurd wek yek îstifade le (hawar) tan biken...

(27) Mîr Celadet jî her di heman hijmarda piştevaniya daxaza wî diket û di det diyarikirin ku eve yek ji armancên kovarê ye û dixala duwê ya bernamê kovarêda di yekem hijmara wê da hatî ye diyarikirin. Di babetekê dî da li jêr navê (eksî seday hawar) nivîskarekê dî ye

başur bi navê (pîrut) piştî pesna kovarê û naverukê wê û kurte pêdaçûnek dîrokî du renge pêşiniazan derbarey tîpên latînî û diyalîktên kurdî berçavdket, dipêşiniazaya duwêda wek (pîrut) dibêjîtle babet lehcey Kurdistanî xwarû serû weye arîşa di hevdû negehiştinê dinavbera her dû diyalêktan berçavdket û bi erikê xwandevanên kurd dizanî bizavê bo yekxistinî lehcekanî zimanî kurdî hewll biden, û paştir dibêjîtblay minewe kovarî (hawar) etwanê lem babetewe yarmetiyekî baş bikat li dîvira çend nimunek bo vê meremê berçavkirîne wek bikar înana peyvên hevpişk di herdû diyalîktanda, bikar înana wan peyvên yên her du alî bi sanahî tê bigehin û paştir berihevkirina ferhengeka hevpişk bo peyvên her du diyalîktan. Li dumahyê jî bi hîvî ye vê rêkê bigirîte ber bo peydakirina diyalêkteka hevpişk.

(28) Bi vî rengî babetê yekgirtina diyalîktên kurdî pwîte pêkirinek giring ji alê kovara hawar) (ve heye û nivîskarên başur pitir ev babete azirandî ye. Ji wan nivîskaran yên giringî bi vî babetî day (hevnidê surî) ye di hijmara 61 babet azirandî ye û sê pirsiyar ji xwandevanan kirîne derbarey çawaniya pakkirina zimanê kurdî û çawaniya ji yeknêzik kirina şêwe zarên kurdî û çawaniya pêşvebirina zimanê kurdî û daxaz ji xwandevanan kirî ye hizir û boçûnên xo li ser van pirsiyaran diyariken.

(29) Belê jiber ku ji hijmar (14)ê ve belavkirina (hawar) ê li îraqê hatî ye qedexekirin û kovar negehiştî ye rewşenbîrên kurdên başur tinê bersiva (lawêkî kurd) di hijmar 12 da û bersiva (Cigerxwîn) û (lacê

henê) di hijmar 32 da hatîne belavkirin.

hawar di 32 hijmarên berahyêda karîgeriyek dîtir di zimanê kurdî da kirî ye, ew jî bikar îna peyvên diyalktên kurdî yên cuda, dê bînîn nivîskarên başur û peyvên kirmanciya bakur bikar îna û yên kirmanciya bakur jî yên başur bikar îna. Li vêrê pêdivî ye amaje bi wê çendê bikeyîn ku di (hawar) êda çend nivîsîn bi kirmanciya başur bi navê kovarê yan bi navê xwediyê kovarê hatîne belavkirin, gelu ev nivîsîne mîr Celadetî bixor nivîsîne...? Erê mîr Celadetî kirmanciya başur zanî ye...? Eve jî babetek dî ye û pêdivî vekolînek dî ye.

Karîgeriyeka dî ya kovara (hawar) li basûrê Kurdistanê kirî belavkirina tîpên latînî ye li vê parça welatî, herwekî li berahiya babetî hatî ye diyarîkirin berî mîr Celadetî û piştî wî hindekan bizavên danana tîpên latînî yên kurdî kirî ye, belê çî jiwan mîna tîpên latînî yên mîr Celadetî neşiyar cihê xo bigirin. Hejî ye bêjîn digel berihvyên mîr Celadetî bo ragehandina tîpên xu tufîq Wehbî jî li îraqê şewazekê dî yê tîpên latînî bo zimanê kurdî berihvedikirin û berî belavkirina (hawar) li (15)ê gulana (1932)ê bi du salan mîr Celadetî û tufîq Wehbî li şamê hevdu dîtî ye û tîpên xo berawrdkirîne û biriyardane tîpên xu biken yek û elîf ba yek yekgirtî ragehînin, belê wek diyar bi her egerekî bît tufîq Wehbî divî warîda harîkar nebûye û eve jî bûye egerê gîrubûna derçûna (hawar) heta (15)ê gulana (1932)ê û her vê çendê jî pal bi nivîskar (lawêkî kurdperwer) venaye li jêr navê kaxezî aşikira bo Gewherî takaney kurdan tefîq Wehbî beg) di hijmar (15)ê ya kovarêda gazindeka dijwar ji tufîq

Wehbî biket jiber ku divî warîda ne yê harîkar bû digel mîr Celadetî.

paştir tufîq Wehbî tîpên latînî yên xo (30) wek xo di pertokekêda li sala 1933 belavkirin. Giring ew e bi derçûna kovara (hawar) di demekê kurda tîpên latînî yên mîr Celadetî li basûrê Kurdistanê deng vedan û serinica rewşenbîran kêşa xo. Ji nivîskarên basûrê Kurdistanê (pîrut) di babetê eksî seday hawar) piştewaniya van tîpên latînî kirî ye û dibêjîtey ziyatir hîwa ebexşet û tîn edat betwana ew rêgay tecedd u tazegiyeye ke kirdutan e be nîşane. Hewe li gewahî eme wergirtin û billawkirdinewey tîp (hiruf) î ferengî ye. Ke berastî bo jiyandinewey kurd û edebiyatî kurdî eme hengawêkî pallewanane ye.

(31) Piştî belavbûna (hawar) bi demekê kurt rewşenbîrên basûrê Kurdistanê bi erikekê netewayetî dizanî fêrî xwandin û nivîsîna kurdî bi van tîpan bibin, zêdebarî vê çendê babetê bikar îna van tîpan bibu cihê danustandinê li navendên rewşenbîryên kurdî, her bo nimune kovara (gelawêj 1939 -1949 bexda) di hijmara 9 sala 1943êda pirsîyarek ji xwandevaran kirî ye beşeweyekî rast û zanisîfî ray xoyan sebarek benûsînî kurdî be elif û bêy erebî. yan latînî derbirin

Di hijmarên paştirda çend rewşenbîrên wî serdemî bersivdaye û piraniya bersivan jî nivîsîna kurdî bi latînî pesend diken.

(32) Ev gengeşe û danustandine dinavbera rewşenbîrên başur derbarey tîpên latînî yên mîr Celadetî berdewam dibin heta sala 1957 cema nebez pertukek taybet bi navê (nûsînî kurdî be tîpî latînî) li bexda çapdket û têda tîpên latînî

yên mîr Celadet bi baştirîn tîpên latînî yên kurdî pesend diket.

(33) piştî vê jî û heta evro bi dehan pertok û vekolîn li ser vî babetî li basûrê Kurdistanê hatîne belavkirin.

Di qonaxa diwê ya jiyê (hawar) êda hjmar 27 nîsana 1941 hijmar 57 tebaxa 1943 karîgeriya hawar li devera badînan ya basûrê Kurdistanê pitir lê hatî ye, wek di çendîn dîdaranda yê me digel xwandevanan û rewşenbîrên wê qonaxê kirîn kovara (hawar) diwê qonaxêda bi handan yan bi rêka rêkxistinên komela (hîwa) bi berfirehî li deverê belavbûye û nîmçe xwandingehên millî jibo fêrikirina xwandin û nivîsîna kurdî bi tîpên latînî vekirîne, herwekî şehîd enwer mayî li xwandingeha mizgefta gundê mayê devera Berwariyan li sala 1942 qutabyên xo digel dersên aynî fêrî xwandin û nivîsîna kurdî bi tîpên latînî dikirin, Mihemed ermexanî ji nivîskarên kovara (ronahî) ya şamê di hijmara 12 da amaje bi vê xwandingehê kirî ye û dibêjît Şêxê gundî Şêx mezher di jiyê pêniçî salîda xu fêrî van tîpên nû kirî ye û piştevanîyê lê diket.

(34) Her bi vî rengî li çend cihên di wek bamerinê, germava û dihukê xelkê bi şiyânên xoyî xulên fêrikirina xwandin û nivîsîna kurdî bi latînî vekirîne. Her divî warîda Mihemed Seyid miftî ku li dwîmahîya salên sîhan û despêka çilan qutabyê qonaxa navincî bû li musil dibêjît: sala 1939 bi rêka seyda Salih yusfî şaneka hizba hîwa li Dihokê hate damezirandin. Û baştir dibêjît: belavok û kovar bo me ji suryê dihatin her çend rojekan carekê

kesek binavê Mistefa Botanî ji suryê dihat û bo me kovarên kurdî yên latînî dînan û her wî jî em fêrî tîpên latînî dikirîn...

(25) Bi vî rengî eger aviriyekê li xwandeve û rewşenbîrên devera badînan yê salên çilan û pênciyên vedeyn dê bînin gelek ji wan bi rêka nîmçe xwandingehên millî û rêkxistinên komela (hîwa) û şiyânên xoyî û karîgeriya kovarên (hawar) û (ronahî) û pertukên kitêbxana hawarê xo fêrî xwandin û nivîsîna kurdî bi tîpên latînî kirî ye.

Li vêrê dê zivirîne ve qonaxa berahyê ya jiyê (hawar) anku 23 hijmarên berahyê, herwek hatî ye diyarikirin her ji hijmarên berahyê ve pêşwaziyek mezin li basûrê Kurdistanê li (hawar) ê hate kirin û rewşenbîrên wê parçê pişkariyek berfireh di berperên wê dakir. Belê wek diyar gehîştina kovara (hawar) bo kurdên îraqê û karîgeriya wê ne bi dilê rijêma melkî ya îraqê bû lewma wek di. Kemal mezher dibêjît hellbet bo karibedestanî rojgarî paşayî desitî needa, zorî nexapand (hawar) îş buwe zadî raporte nihênîyekan (namey êmewenamey berêztan) dest pê dekat ta rojî 42 kanûnî duwemî 3391 fermanî wezîrî nawixu nacî şewket, ke her bo xoyşî seruk wezîran bû, bo qedexekirdinî hawar derdeçêt.

(36) Anku rojekê berî belavbûna hijmar (15)ê li 23 kanuna duwê 1933 û 24 rojan piştî derçûna hijmar 14 li 31 kanuna êkê (1932)ê ev biriyare derdikevît

Eve dibîte egerê nîgeraniya xwandevevanên kovarên li îraqê û bi naman agehdariya mîr Celadetî diken, ew jî li 12 adara wê salê nameka taybet bo wezîrê navixwyê îraqê

dihinêrît û têda diyardket ku piştî hijmar 14 kovara negehiştî ye xwandevevanên wê liêraqê û hijmarên paştir jî dest bi serda hatî ye girtin, her çend e kovar kovareka edebî zanistî ye û bi çî rengan mayê xo di siyaseta îêraqêda nekirî ye, paştir dibêjît: Eve du heyiv biser qedexekirina kovarê li îêraqê bûrîn û sê hijmar hatine belavkirin û wî hîç helwîst beramberî vê çendê wernegirtîne û pêgîrbûye bi niyaz paqijîya xo û neviyaye bi nihênî kovarê bigehînte îêraqê ku dişyanên wî da bûye. Li dîmahyê daxazê diket--dubare hikumeta îêraqê muleta belavkirina kovarê bidet û ew hijmarên dest biserda hatî ye girtin bigehînte xwandevevanan.

(37) Bi vê çendê xwandevevanên basûrê Kurdistanê jî (hawar) ê dihêne bêbeşikirin û jî hijmar 14 û paştirive bi kêmfî berihemên wan di (hawar) êda dihêne dîtin.

(38) Ev qedexekirine ya berdewam bûye, ne daxaza mîr Celadetî bo wezîrê navixwyê îêraqê mifadaye û ne çend bizavên dîtir her wekî mîr Celadetî bixu di hijmar 21 ya 5 ê hizîrana 1933 da dibêjî eve şeş mehin ku hikumeta îraqê nahêle kovara me bikevît erdê îêraqê, heta niha, bi hîvî ya ku hikumeta îêraqê emrê memnûyetê rakit û weke berê destura kovara me dê bidet, me deng nedikir. Me çend caran meraceet kir, me jiwan re dazanîn ku hawar kovarek e edebî ye û eleyhî dariya îêraqê nekirî ye û nakit jî. Paştir nexo û nexwandevevanên başur bê hîvî diket û diyar diket ku dê helwîstekî li ser vê çendê wergirît û dibêjît: xwest, îrojî em dixwazin vê meseleyê bi qencî û dilxuşî safî bikin û bihev mekevin. Lê heke nebû hingî em jî fikir û gutina xu ser vê

meseleyê bibêjin. Lê êdî bila lime negirin, me bihna xwe, şeş mehan fireh kir.

(39) Herwekî bixwe dibêjin sûç ê despêkerî ye (albad azlem)

Piştî vê hijmarê tinê du hijmarên dî 22 û 23 jî kovarê li tîrmeha 1933 derdikevin û diwan hijmaranda jî nîşanek nîne ku dergehên îêraqê li ber (hawar) hatin vekirin.

Hijmara 24 ya (hawar) ê piştî şeş heyivan anku yekê nîsana 1934 dihête belavkirin, divê hijmarêda guhirînek nû di (hawar) êda dirust bûye ku hemû berperên wê bûyine tîpên latînî, kovarê egera vê çendê diyar nekirî ye, belê bi hizra me egerê vê çendê ew e 23 hijmarên berahyê wek qonaxeka ezmûnî bûn bo tîpên latînî yên mîr Celadet, diwan 23 hijmaranda ko kovar bi herdu tîpên erebî û latînî derdiket, tîpên latînî cihê xo girt û xwandevevan lê aşnabûn û ev qonax bi dawî hat û dest bi rênivîsa nû ya tîpên latînî hate kirin.

Piştî hijmara 24 tinê du hijmarên kovarê hijmar 25 li tebaxa 1934 û piştî wî bi salekê hijmar 26 li tebaxa 1935 hatine belavkirin hindî peywendî bi basûrê Kurdistanê ve hey tinê yek babetê lawêkî pişder di hijmar 24 da bi navê (mijde) û babetekê tufîq Wehbî di hijmar (26) bi navê (Mameyar e) jî berihemên nivîskarên basûrê Kurdistanê diwan sê hijmaranda hatîne belavkirin.

Xwediyê (hawar) ê di hijmar 24 da bi navê (name le bolawanî kurd le îraq) nivîsînek belavkirî ye têda diyar dibît ku qedexekirina (hawar) ê li îêraqê hêj ya berdewame belê ya xwediyê (hawar) ê divê namêda lê digerît û pirsîyar diket eve boçî lawanî îraqî weku pêşu

meqale û şîr bo hawar nanûsin. Bellê lew rojewe ke hikûmetî îraq hawarî boyiraq bendkirduwe. Lawanî îraqîş desitî xoyan lê kêşawetewe. Ebwayewehane buwaye... xwediye (hawar) î divê nameyêda di det diyarikirin ku berihemên nivîskarên başur nagehine kovarê jiber ku kovar nagehîte îraqê û her wekî ew nivîskare di dilê xoda bêjinnûsirawêk ke min li şikilî çapda neyibînim boçî û bokêy binûsim...

(04) paştir xwediye (hawar) rexne li ve boçûnê digirît û daxazê jî nivîskarên başur diket berdewamyê bi nivîsînê bo hawar biden, eger ew jî berihemên xo yên çapkirî di hawarêda ne bînin dê ew yên paşerojê bînin.

Piştî nêzîkî şeş salên rawesitiyanê qonaxa duwê jî jyê harar bi hijmar 27 li (15)ê nîsana 1941 despêdket, divan şeş salanda çendîn guhîrîn di kawdanê siyasyê Kurdistanê û cihanêda rûdiden.

Li sala 1939 komela (hîwa) li basûrê Kurdistanê dihête damezirandin, rêkxistin wê seranserî basûrê Kurdistanê vedigirin, kadir û endamên (hîwa) rolekê giring di rewşenbîrikirin û hişyarikirina xelkê û belavkirina kovara (hawar) û çapkiryên di yên Bedirxaniyan û fêrikirina xelkî bi dixwandin û nivîsîna kurdî bi tîpên latînî digêrin, divî warîda hijmareka endamên komela (hîwa) 1939 -1945 li Dihokê tekîd dikan ku (hawar) digehişt wan hemiyan û wan jî li deverî bi qutabîyan û cutiyaran di daxwandin.

(41) Ji aliyekê dîve despêkirina şerê cihanyê duwê delîve li ber mîrCeladetî vekirin serjinwî dest bi belavkirina (hawar) li (15)ê nîsana 1941

biket û paştir kar di belavkirina kovara (ronahî) şam nîsana 1942 -adara 1945 biket.

Wesan diyar e divê qonaxêda qedexekirina (hawar) ê li îraqê nemaye yan jî sivik tir bûye û divê qonaxêda (hawar) bi berfirehî digehişt basûrê Kurdistanê û seranserî îraqê û lîsta abunên (hawar) ya nivîskar dilawezê zengî jî deftereke mîr Celadetî wergirtî û belavkirî û bi pêdaçûna navên ve lîstê diyar e ev abuneyê yên ve qonaxêne, li dwîv serjimêra me divê lîstêda kirî 243 kesan li seranserî îraqê pişkdarî di (hawar)êda hebûye, ev pişkdar e ne tinê li bajêr û bajêrikên Kurdistanê bûne, belkî li paytext û bajêrên naverast û jêriya îraqê bûne û gişt tex û cwînên xelkê Kurdistanê jî serikirde û kesayetyên siyasî, rewşenbîr û nivîskar û rojnamevan, zanayên ayînî û Şêxên terîqetê û serok eşîret, qutabî û Mamosta û fermanber û karker, dadiwer û parêzer, efsêrên kurd di supayê îraqêda û çend dezgehên rewşenbîrî û civakyên kurdî û biyanî li îraqê vegirtîne. (42) eve jî nîşana hindê ye divê qonaxêda (hawar) bi berfirehî li nav kurdên îraqê belavbûye û digehişt gişt tex û cwînên cuda cuda. Her divê qonaxêda wek pêşitir jî hatî ye diyarikirin bi karîgera hawar û çapkiryên di yên Bedirxaniyan û bi handana komela (hîwa) li basûrê Kurdistanê bi taybet li devera badînan bizavên fêrikirina xwandin û nivîsîna kurdî bi tîpên latînî bi rengekê baş belavebûye.

Li vêrê hejî ye bêjîn pişkdariya nivîskarên basûrê Kurdistanê ewên di qonaxa êkê ya jyê (hawar)êda bi berfirehî pişkdarî di berperên (hawar)êda kirî, divê qonaxêda zor ya kêmbûye yan jî ya degmen bû, bi hizra me eve jî



dizivirîte ve bo çend egerekan ji wan

Divê qonaxêda (hawar) tinê bi tîpên latînî hatî ye belavkirin, ew nivîskarên başur yên di qonaxa êkêda pişkdarî kirî ew bûn yên bi tîpên erebî berihemên xo belavdkirîn.

Divê qonaxêda rojnamevaniya kurdî li îeraqê di kawdanekê baştir da bû, pitir delîve li ber nivîskarên basûrê Kurdistanê hebû berihemên xo li kovar û rojnamên kurdî yên îeraqê wek gelawêj 1939 -1949 û rojnama (jîn) da belavken. Belê di dawîya vê qonaxê ji jyê (hawar) êda nivîskarên devera badînan ya basûrê Kurdistanê pêgehiştin û dest bi belavkirina berihemên xu bi tîpên latînî di (hawar) êda kir, eve jî despêkeka nû bû, yekem car bû nivîskarên vê deverê pişkdayê di rojnamevaniya kurdî da biken û pêşengê van nivîskaran şehîd Salih yusfî bûyê bi navê Salih bamerinî bi helbestekê pişkdarî di hijmar 39 ya (15)ê şubata 1942 da kirî û piştî wî jî Şêx memduh di hijmar 50 da û Mela enwer di hijmar 52 da û careka dî Salih bamerinî di hijmar 55 da pişkdarî kirî ye, paştir wan û hindek nivîskarên dî yên vê deverê pişkdarî di berperên kovara (ronahî) ya şamê 1942 -1945 da kirî ye.

(43) Li dawîya babetî dê bêjîn zêdebarî karîgeriya mîr Celadetî û kovara (hawar) û çapkiryên dî yên Bedirxaniyan li basûrê Kurdistanê eger kawdan bi vî rengî yê berdewam ba û (hawar) bi vî rengî berdewam ba û gehîştba deverê û bizavên fêrikirina latînî di berdewam bane, em diwê bawerêdane sereray bê beşikirina devera badînan dwî serdemîda ji xwandina kurdî bi rengêkê resmî û bê beşikirina wê ji jêderên rewşenbîriya kurdî, da bizaveka

xwandevanî û rewşenbîriya kurdî ya xurt li deverê peydabît, çinku şwînewarên wê texa xwandevan yên bi karîgeriya (hawar) ê û berihemên dî yên mîr Celadetî diwê qonaxêda fêrî û xwandin û nivîsîna kurdî bi tîpên latînî li deverê bûyin heta van salên çûyî jî ya diyar bû.

### Jêder û perawêz

1-Ebdulla Zengene û refîq Salih, raberî rojnamenûsî kurdî, kovara rojnamevanî, hijmar 11 -12 hewlêr 2003 , bip144 -156.

2-cemişîd heyderî, kovara hawar, kovara rojnamevanî, hijmar 5 , hewlêr2001.

3-kunê reş, alamîr ciladit Bedirxan (hiyate û fikire) dimişîq-1992. . 1bip 46

4-konê reş, jêderê çûyî, bip 49.

5-konê reş, berperê çûyî, bip 50.

6-rohat alakum, xwîbun û pure agirî, mirace: Şkur misgfi, arbîl 1999 , bip 42.

7- D. Kemal mezher, çend lapereyek le mêjûy gelî kurd, bergî duwem, hewlêr-2001 , bip 290.

Hejî ye li vêrê bêjîn liqekê (xwîbûn) li bajêrê musil jî hebû, binêre D.Ebdulfetah Elî Botanî, alhiyae alhzbî ye fi Alimusil, arbîl-2003.

ruhat alakum, jêderê çûyî, bip 24. 8-

9-Kurdistanî îraq li belgenamekanî wezareti derwey birîtaniya da, û .Selman Elî, binikey jîn-Silêmanî-2005 , bip 83 -83.4 kunê reş jêderê çûyî, bip 5 10-

11-leCeladet Bedirxanewe bo Huznî mukiriyani, D.Osman reşad miftî, kovari rojnamevanî, hijmar 9-2002.

- 12-kovara hawar, hijmar 5 tîrmeha 1932 - şam, bip5.
- Bo hemû hijmarên kovara hawar me mifa ji çapa kombenda Kawe, hewlêr2001 wergirtî.
- 13- kovara hawar, hijmar 1 çiriya berê (1932), bip 7.
- 14- kovara zarikirmancî ku hijmara wê ya êkê 25/5/1926 derketî ji hijmar 23 ya 4 hizîrana 1930 verawesitiyaye û hijmare 24 li 23 tîrmeha (1932) deriketî ye û dubare rawesitiyayeve.
- 15-Ebdulla zengene, tîşkêk bo ser...?, kovara. rojnamevanî, hijmar 5 sala 2001 bip 229.
- 16- kovara hawar, hijmar 3 -15 hizîran (1932), bip 3.
- kovara hawar, hijmar 6 tebaxa (1932)17 -( . bip 1 -2
- 18.- - kovara hawar, hijmar 8 -21 îluna (1932), bip8 18
- 9119- kovara hawar, hijmar 41 -13 çileyê berê (1932), bip4.
- 20-kovara hawar, hijmar 22 , yekê tîrmeha 3391 , bip 5.
- 21- D.Kemal mezher, jêderê çûyî, bip 353.
- 22- D.Kemal mezher, jêderê çûyî, bip 384.
- 23- kovara hawar, hijmar 22 , a tîrmeha 1933 , bip 4.
- 24- kovara hawar, hijmar 11 , 10 çiriya paşî (1932),bip4.
- 25- kovara hawar, hijmarên 12 , 14.
- D. Kemal mezher, têgeyîştinî rastî, bexda, bip.26
- 27- kovara hawar, hijmar 3 -15 hizîrana (1932), bip 3.
- 28-kovara hawar, hijmar 10-23çiriya berî (1932), bip1-2.
- 29-kovara hawar, hijmar 61 -51 şubat 3391 , bip 1 -2.
- 30-kovara hawar, hijmar 51 -22 çileyê paşî3391,bip 2-4.
- 31-kovara hawar, hijmar 10-23 çiriya berê (1932),bip1-3.
- 32- D.Ewrehmanî Hacî marif, nûsînî kurdî be elfubêy erebî, bexda 1986 , bip15 -25.
- 33- Cemal Nebez, nûsînî kurdî belatînî, bexda-1975,bip5.
- 34- kovara ronahî, hijmar(1)êkê adara 1943,bip10 -11.
- 35-kovara Dihok, dîdarek digel hêja Mihemed Seyid miftî, hijmar 17 tîrmeha 2002 , bip 20.
- 36- D.Kemal mezher jêderê çûyîy, bip 353 - 354.
- 37-D.Kemal mezher, jêderê çûyî, bip354 - 356 , deqê. namê bi erebî ye û hêjayê D.Kemal mezher ji badekên nivîsîngeha taybeta wezaretê navixûya îraqê wergirtî ye.
- 38-D. Kemal mezher, jêderê çûyî, bip358.
- 39- kovara hawar, hijmar 21 -5 hizîrana 1933 , bip1.
- 40-kovara hawar, hijmar 24 êkî nîsan 1934 bip 9.
- 41- Selah hirurî, me endamên hîwa jibîr kirîne, rojnama birayetî, hijmar 2289 -2290 , adara 1997.
- 42- kovara pirs, hijmar15 payîza 1988.
- 43-musedeq tovî, ronahî vekolînek dîrokî, rewşenbîrî, hewlêr 2005 , bip 18 -19.

# MEDYA Û BERNAMEVNÎ DÎKSIYON ( XWEŞAXAFTÎN )

## Deniz Dargul

**5-Ekspresyonîzm (Derbirînerî):** Bingehê xwe ji çanda Gotîk digre ku di navenda Ewropa'yê de pêl daye. Li navenda Almanya pêş ketiye û li wir berferêh bûye. Ev bizav, di navbera salên 1910-1920'an de, tesîra xwe nîşan daye. Lê bingeha xwe jî, ji nîşek ronakgeran ku di navbera 1885 û 1895'an digre. Ev koma ronakgeran ji aliyê serokê împaratoriya Alman 2. Wilhelm ve hatiye pêşxistin.

Ev pêvajoya Ekspresyonîzmê, taybet piştî şerê di navbera Prûsyayê û Fransiyayê (1870-1871) de pêş dikeve. Almanya heta wê demê pir parçe ye, tevliheviya navxweyî gelek mezin e. Sîstema feodal û eşîrtî civaka Alman parçe kiriye. Lê piştî wendakirina Fransiyayê, tevliheviya di nav Alman'an bi xwe de çareser bû. Vî şerî rê li ber yekîtiyek xurt a netewî vekir. Di heman demê de, têgihîştina "Nijada Mezin a Alman" pêş dikeve. Her wiha pêşketina sanayiya vî welatî, Almanya anî wê rewşê ku bi Îngilîzan re bikeve nava pêşbirka aborî. Her wiha vê rewşê rê li ber serxwedêçûyînek, di dewleta Alman de vekir. Di bin silogana "Em Almanya ava bikin" ji

zarokan bigre heta kalan rojê di navbera 14 û 18 saetan de bi berdêlek biçûk a heqdestiyê didan xebitandin. Bi awayeke gelek xurt civak bajarên sanayî pêş dixin. Ji gundan koçberî ber bi bajarên ve pêş dikeve. Çandîna û bazirganiya bi derve re bihêz dibe. Bi tevî pêşketina sanayiya bajarên, zanebûna karker û ronakgeran jî xurt dibe. Ev dem mirov dikare wek salên di navbera 1871 heta 1914'an de binirxîne.

Karbidestên jî ev yek fersend didîtin û derdorên împaratoriya provake dikirin û dixistin stûyê ronakgeran. Di encama du sînkastên li hemberî împarator zor li parlamenê kirin, da ku hin yaseyan biguherînin. Her wiha pey girtina van yaseyan, gel û karker wek dijmin hat dîtin. Yanî têgihîştina 1. Wilhelm ku yekîtiya Almanya saz kiribû û xebata 2. Wilhelm ku yekîtiya mîlî çêkiribû, wê Hîtler jî bi sazkirina têgihîştina Nazîzmê civaka Alman û gelên derdorê ber bi felaketê ve bibirana. Çawa ku Hz. Musa di dema xwe de çend qabileyên cihûyan li hev civandin û nîşê herî mezin û pîroz saz kir, 1. Wilhelm û 2. Wilhelm jî hemû qebîle, eşîrên Alman li hev civandin û

“Nîjada Herî Mezin a Alman” saz kirin. Di rastiye de jî 2. şerê cîhanê lihevketina her du nîjadên (Nîjada Herî Mezin Alman, Nîjada Herî Mezin Cihû: Xwedê ew taybet afirandine) herî mezin ên cîhanê bûn.

Lê ev rewş ji aliyê ronakger, hunermend û nivîskaran ve, hînê ji dest pê ve dihat dîtin. Di van bajaran de ku bûrjûvazî serdest bû, ji bo ku sîstema baviksalerî ser lingan bimîne her tişt dikirin. Di nav malbatê de gotina bav a destpotîk derbas dibû. Malbat û civak jî li gorî vê yekê dihatin perwerdekirin. Lê ronakgerên ciwan, nivîskar û hunermendan ev rewş rexne dikirin û li dij derdiketin. Lê nişê kevin di warê sîstema xwe ya destpotîk de xwediyê biryarê bû, ku xwe li ser lingan bigre. Di navbera lawikan û bavên de, nakokiyek gelek mezin rû dabû ku, êdî xisûmet di famîleyan de nemabû. Ji nivîskarên demê, Frans Kafka di eserên xwe yê bi navê “Ji bavê re name” û “Dawa-Doz” de, hevketina di navbera bavên û lawikan de destnîşan dike. Franz Werfel jî, di esera xwe ya bi navê “Ne yê dikuje, yê dide kuştin tawambar e” de, nakokiyên heman demê destnîşan dike. Her wiha ka desthilatdar çawa civakê dikin dijminê hev û din tê destnîşankirin. Di van eseran de, ka malbat di nav sîstemek çawa de dije radixîne berçavan. Di dema endamên malbatê bi hev re dijîn wek dijminan in, lê dema ji hev û din dûr dikevin, bêriya hev û din dikin. Taybet di van eseran de xala girîng ew e ku, nakokiya di navbera kevin û nûjeniyê de radixînin berçavan. Arnold Bronnen “Katilê Bavê”, W. Hasenclever “Kur”, Reinhard Sorge “Parsek”, Frank Wedekînd

“Zindîbûna Biharê”, mirov dikare di eserên van nivîskaran de, wek minak destnîşan bike, ka pêvajoyek çawa malbatê domandiye. Pirsgirêkên perwerdeya sîstema demê, di romanên xwe de eşkere kirine ku, ev roman piraniya wan di şanoyan de hat bikaranîn. Di dema pêvajoya ekspresyonîzmê de, zor û zehmetiya li ser ciwanan gelek mezin bû. Di bin navê perwerdeyê de, li ser ciwanan nîzama leşkerî ya hişk li ser dihat ferz kirin. Ji ber vê yekê, li dijî sîstemê tevgerê ciwanan û ronakgeran hebû. Ronakgerên dema ekspresyonîzmê li hemberî sîstemê xwediyê bêzariyek gelek mezin bûn. Hemû kes li dij sîstemê bû. Dixwestin sîstem hilweşe. Lê di warê avakirinek nû de, ne xwediyê ti pîlan û projê bûn. Hin ji van ronakgerane têgihîştinek hûmanîst, weke di warê paqîjkirina rûhê mirovan, civakek biehlaq, wek hev û azad û hwd. de diparastin. Li gorî vê têgihîştina van derdoran mirov jixwe baş e, rûhê mirov hatiye qirêjkirin. Ê rûhê însan qirêj kiriye jî desthilatdarî ye. Aliyê din ê ronakgeran û hunermendan; encax mirov tê bikoşe, bi ked û emekê, wê sîstemê biguherîne. Ev herdu têgihîştin ji hev û din pir cuda ne. Lê herdu alî jî, di warê hilweşîna sîstemê de li hev dikirin. Lê di warê bizavê de qels bûn û hêvî nedan gel ku, sîstemek nûjen were saz kirin. Her wiha piştî 1. Şerê Cîhanê piraniya van derdoran û ronakgeran ev dem hat şopandin xwe birêxistin kirin. Komek ji wan felsefeya Marx ji xwe re kirin pêşeng. Serkêşiya van ronakgeran Ernst Toller dikişand. Toller, bawerî bi komunîzmê hebû. Nivîskar Toller bi Kurt Eisner re li dijî

şer meşek organîze kiribû. Di sala 1918'an de, bi tevî karkerên çêkirina Cebilxana Munih'ê ketibû greva birçibûnê. Gelek caran tê girtin û bi salan temenê xwe di zindanan de derbas dike. Tollner di sala 1939'an de, dema Nazi hatin desthilatdariyê, koçî New York'ê kir û di hotelekê de xwekuştî hate dîtin. Endamên din ên ronakgeran, hin ji wan ji aliyê Naziyan ve hatin kuştin û hin ji wan jî koçî welatên cur be cur kirin. Carly Sternheim, çareserkirina pirsgerêkên civakê di esera xwe ya bi navê "Kilot" de; başiya mirovan rûhê wî yê paqij di listikê de nîşan dide. Ka sistemek çawa vê civakê ber bi rizgariyê ve bibe radixîne berçavan. Her wiha di leyiztina Sorge ya bi navê Parsek de jî, heman mijar hatine rojevê.

Taybet di van listikan de retorik esas hatiye girtin. Di warê hunera xweşaxaftinê de, gavek nû avetiye. Li gorî Sternheim û Sorge; eger civakek hatibe perçiqandin, zimanê wî yê azadiyê jî hatiye xerakirin. Ji ber vê yekê, di listikên xwe de hunera xweşaxaftinê esas hatiye girtin. Carly Zuchmayer jî di eserên xwe yê tiyatroyê de heman xet esas girtiye. Zuchmayer, di listika xwe ya bi navê Serbazê Kopenick de, rewşa Naziyan jî destnîşan dike. Di karektera listikên nivîskarên dema ekspresyonîzmê de, taybetiya karekterîstîkê Fathos (Hebûnek e ku êş û elem dide) bû. Li gorî Şiller jî Fathos etîkek bingehîn a ehlaq e. Hêza îrade ye ku, li dijî hebûnên xerab ên di hest û mejî de rû didin derkeve. Di nav ronakgeriya Alman de, gelek maneyên Fathos hene, hin ronakger wek bingeha hêza retorik jî qebûl dikin.

Ji nivîskarên Alman ên dema

ekspresyonîzmê de ku mora xwe li hunera şanoyê xistine George Kaiser, Ernst Toller û Bertolt Brecht e. Brecht, pey re, ji têgihîştina Ekspresyonîzmê xwe dûr xistiye û bi estetîk û têgihîştineke nû tesîr li ser şanoya nûjen kiriyê. George Kaiser jî, ji sala 1918 heta 1920'an qasî 20 listikên şanoyê nivîsandine. Di listikên xwe de, sistema kapîtalîst û psîkolojiya civakê radixîne berçavan. Ernst Toller jî, di zindanê de, listika bi navê "Guhertin" dinivîsine. Ka hunermendek li hemberî desthilatdariyê çawa ser hildide destnîşan dike.

Di dema Ekspresyonîzmê de, rewş sistem bû. Her kes li dijî sistemê bû. Ji bo hilweşîna sistemê hemû kes hemfikir bûn. Taybet hunermendên vê demê, di warê berhema pîroz a gerdûnî de, gavên gelek binirx avêtine. Têkoşîna ronakgeriyê ya dema 1. Şerê Cihanê û 2. Şerê Cihanê ne hêsan bû.

**6-Realîzm (Rastîbînî):** Realîzm, rastîdîtina hebûnên di nava xwezayê de ye. Helwesteke ku tiştan wekî rastiya heyî, binirxîne. Her wiha realîzm ji bo destnîşankirina jiyana civak, xweza û zindiyan, helwestek ronakgeriyê ye. Ev têgihîştina ronakgeriyê di dawiya sedsala 18 û destpêka 19'an de pêş ket. Lê gotara realîzmê, ji serdema Homeros heta Milton, Sofokles, Shakespeare, Tolstoy û Gorkî tê bi kar anîn û heman nivîskar wek nivîskarên rastîbînî tînanaskirin. Ronakgeriya rastîbînîyê, piştî bidawîbûna sistema feodal a girtî de pêş dikeve. Her wiha di dema desthilatdariya (ronesans) bûrjûva de, pêşiya huner tê vekirin. Sermayedar ji bo ku huner bixin bin desthilatdariya xwe tev digerin. Lê ronakgerên

heman demê jî, ji bo ku huner bixin bin xizmeta civakê tev digerin. Yanî ronakgerên realist, bi silogana “Huner ji bo huner, huner ji bo civakê” dikevin nava bizavê. Lê sistema bûrjûva bersiva hêvî û daxwezên wan nade û berevajî rol dileyize.

Sîstema Sermayedar a bûrjûva, di dewsa pêşxistina kesayetê ahengdar de kesayetê bêaheng, di dewsa civakê biîrade de civakê bêîrade, di dewsa civakê lihevker de, civakê lihevketî, egoîst û xweperest pêş dixist. Hînê di destpêka ronakgeriya romantîkê de zanyar Rousseau, ev rewş destnîşankirî bû û sîstema bûrjûva rexnekirî bû. Di eserên xwe de ev helwesta sermayedaran û rastiya civakê raxistibû ber çavan.

Di eserên ronakgerên vê serdemê de pîr û pakî, ezmûngerî û biedebî ser her tiştî ye. Yanî rastiya kesayet û avakirinek nû ne bi gotin bi pratîk destnîşan dikin. Bizava mirovan, wek dimenê rûhê însan dibînin. Ronekgeriya serdema romantîzmê û ya rastîbîniyê ji hev ne dûr in. Wek mînak: Li gorî ronakgerên dema romantîzmê “Pêwîst e kesayet azad be, aqil jî riya jiyanê destnîşan bike” realîzm jî diyar dike ku “Însan dema ji dayik dibe, azad û wekhev e.”

Ev yek tê wê maneyê ku nabe mirov were qirêjkirin. Ji ber vê yekê mirov di destpêka xwe de paqij e, lê çawa destê mirovê qirêj pê dikeve, ji rastiya xwe tê dîrxistin û rûhê wî, dest û piyên wî, çaven wî, giyana wî, bi zend û bendan tê girêdan. Koledariya mirovan, di dema ji dayik dibe û şeqam lê dikeve tê destpêkirin. Ji ber ku ne weke ku diya wî

dixwaze, weke ku sîstem dixwaze, tê xwedîkirin. Yanî rûhê merivan, hînê di zarokatiyê de tê dizîn.

Ji ber vê yekê ronekgerên dema pêvajoya realîzmê, taybet li ser bizava kesat sekiniye. Weke ferbûn, bizav, pîr û pakî, cîhana hundirîn û kevneperestiya însan û hwd. heman mijaran di eserên xwe de jî, diyar dikin.

*“Nivîskarê Alman Hebbel, di esera xwe ya bi navê ‘Mariya Magdalena’ de, rastiya ku civak di navê de dije, karakterên feodal, karakterên pîr û pak û jîr, cî digrin. Di heman listikê de, qîza bi navê Klara, ji aliyê bavê wê ve, bi darê zorê tê zewicandin, lê dema ku zilamê Klara wê ducanî dihêlê û terk dike, di dewsa zarok bîne dinê, xwe diavêje kortalekê û xwe dîkuje. Ev çalaki tê wê maneyê ku beriya zarok were cîhanê dest û piyên wî tîn girêdan. Klara dibêje, beriya ku zarokê min were kuştin, ez dixwazim xwe bikûjim û zarokek dest û piyên wî girêdayî, nebînim.”*

Di heman demê de, ronekger bi vê têngihîştine, armanca wan ne ew bû ku bêehlaqiyê tespît bikin, tespîtkirina sedemên bêehlaqiyê derdixistin holê. Di listik, roman û giştî eseran de, ev karakterane tîn dîtin. Rastiya civakê çawa ye, bi hunera nivîsa zanyarî û pratîk tê destnîşan kirin. Di pêvajoya realîzmê de, bi nivîsandina 400 listikan, ê ku mora xwe li demê xistiye, Eugene Schrîbe La Brûyer e. Li gorî vî nivîskarî, listika şanoyê dişibe giyana însan. Giyana mirovan, çawa ku di nav sîstemê de dixebite, şano jî ji vê rastiye destnîşan dike. Her wiha di eserên xwe de tê

diyar kirin ku 'ne tiştê ku rûyê wê tê ditin, cewhera wê pêwîst e were ditin'. Ev yek nîşan dide ku, rû cewher bi xwe ye, pêwîst e cewher were dîtin. Di realîzmê de cewher; wek estetîk û dewlemendiya huner tê qebûlkin.

Ji nivîskarên heman demê Gerhardt Hauptmann, xwediyê eserên wek "Roja ku Dihele", "Tevnker", "Mirovên bi Tenê", "Roja ku Ava dibe" û hwd. wek listik weşandiye.

Di van eseran de, aliyên civakê yên xerab rexne dike û sedemên wê bi awayeke rast radixîne berçavan. Her wiha di esera bi navê tevner de, serhildana Silezya ya 1840'an ku bavpîrê wî jî, di heman serhildanê de cî girtibû, hatiye nivîsandin. Di esera bi navê "Mirovên bi Tenê" de rewşa civakê êşkere dike ku, xwe ji nişê kevin dûr dixê. Nakokiya di navbera ciwan û kalan de, bi listikê êşkere dike. Her wiha listika bi navê "Roja ku Ava dibe" de evînek bêhêviya demsala payîzê dinivîsîne.

Di heman demê de nivîskarên wek Puşkîn, Balzac, Gogol, Stendhal jî jiyane. Lê ji ber ku felsefeya romantîzmê jî, li heman deverê pêl daye, li ser van ronakgeran hem tesîra romantîzmê, him jî tesîra rastîbîniyê heye. Herdu têgihîştin jî, dixwazîn pêşketinên dîrokî, sosyalî û civakî pêş bixin. Di berhemên van ronakgeran de nirxa pîroz ne tenê madiyet e, nirxa herî pîroz manewiyata însan e. Eger însan were mezinkirin, wê madî û manewî jî pê re were. Balzac dide zanîn ku; "Realîzmê di warê guharîn û veguherîna civakê de, gavek berbiçav avêtiye. Ji ber vê yekê mirov dikare realîzmê wek rastiya civakê binirxîne." Di destpêka sedsala 19'an de ronakgeriyek mezin ku pêl

dabû, Uris bû. Li Rûsya, ji ber tevgera ronakgeriyê civak serûbin dibû. Ev pêvajoyê li Rûsya, bi Pisemki dest pê dike, bi Gogol, Gribodeyev, Turgenyev, Ostrovski berdewam dike. Di dema Tolstoy xwe digihîjîne serdemê herî xurt. Tolstoy, esera xwe ya yekem a şanoyê, listika bi navê "Hostayê Şarabê" dest pê kir. Pey re bi hêza tarîtiyê ve domand. Di yekem eserê de, bêsînorîya vexwarina şarabê ya gundiyên Rûsya radixîne berçavan. Esera duyem jî, rewşa civaka Ewropa ku di navê de ye, destnîşan dike. Di van eseran de edeb û bêedebîya mirovan a li hemberî hev û din di nivîsê de cî girtiye. Van eseran tesîrek gelek mezin li ser ronakgeriya Ewropa jî kir. Gelek nivîskaran, heman xet şopand ku wek perspektîfêkê bi hunera şanoyê diyarî civakê dikir. Tolstoy, mirov di serî de, hêza wî ya fîzîkî, pey re cîhana hundirîn, bi hostayiyek gelek mezin ve nirxandiye. Kesayet, rewşa wî ya di nava civakê de pîrgirêk û riyên çareseriyê bi pisporiyek gelek mezin ve darijandiye ser rûpelên spî. Her wiha kuterxurî, bertîlxurî ya aristokrasîyê, zordestiya axan a li ser gundiyan, karaktera gundiyê, ya herî baş tarîf dike, Tolstoy e. Tolstoy, demê dirêj navberê dide xebata ronakgeriyê. Piştî demê dirêj eserên bi navê "Ronahî di tarîtiyê de dibiriqê", "Miryê Dijî", "Şer û Aştî" dinivîsîne. Şer û Aştî, taybet jiyana qehremanan, pêşketina wan û rola wan a dîrokî radixîne ber çavan. Di van hemû nivîskarên li jor hatine rêzkirin de, di eserên wan de, tesîra romantîzmê tê ditin. Lê yê xwe ji romantîzmê rizgar kiriye û rastiya civakê bi awayeke

rastîbînî ( realist) nirxandiyê Maksîm Gorkî ye.

Maksîm Gorkî, bi lîstika bi navê “Bûrjûvayên biçûk” dengê xwe bilind kir. Di vê lîstika xwe de malbata bazirganekî ka çawa keda karkeran dixwe, derdixwe holê. Her wiha di lîstikê de mezinên bûrjûva nezan, bêmeji û xweperest, ciwanan jî, weke ku kêmasiyan dibînin lê hêza çareseriyê pê re tune ye. Her wiha di warê rûhî de jî, di nav sergêjiyê de ne. Ji ber vê rewşê, ciwanên bûrjûva di nav jiyaneke betal, vala, bêked, xweperset û di nav rewşek gelek xerab de derbas dibin. Gorkî, di vê esera xwe de bûrjûvayan dixwe bin erdê. Jiyanê wan a rûtin û bêmane, nîqaşên vala û gotinên bêtuke di lîstikê de, cî digre. Gorkî di lîstika xwe ya bi navê “Di nav Koma Pêxwasan” de, her wiha ev lîstik wek “Çend dîmen ji jiyana Rûsya” jî tê binavkirin. Di vê lîstikê de kilerêk hatiye çêkirin û di wê kilerê de ji dizan bigre heta serseriyên, dexesan û derewkaran, cî digrin. Ev rewş şibandiyê sîstema Rûsya Çarlix’ê. Li hemberî vê rewşê, bêzariya gel destnîşan dike. Ka li hemberî vê rewşê çawa dengê xwe bilind bike, peyva dide.

Gorkî, di warê eleqedariya şanoyê de, ji Anton Çekhov bi tesîr dibin. Gorkî, di wê baweriyê de ye ku, rizgariya civakê encax bi sazkirina sîstemek nûjen dikare pêk were. Ji bo vê yekê kesayetek ku rûhê wî paqij be, xwe ji xweperestiyê rizgar kiribe. Kesayeta xwe ji hemû kevneperestiyên dîr xistibe û têkoşerek azadiyê be, wê demê mirov dikare bahsa rizgariya civakê bike. Ji ber ku civak ji kesayeten pêk tê, eger kesayet xwe sarerast bike, wê demê mirov dikare bahsa civakek azad

bike. Jixwe Gorkî, kesayetek şoreşger e. Hemû jiyana xwe di sazkirina kesayet, civakek birûmet û hemdem, hest û mejiyek bêsinor de serf kiriye. Heta çû ser dîlovaniya xwe jî, destê wî ji pênûsê qut nebû. Lîstika wî ya dawî jî nivî ma.

Ûn mora xwe li vê serdema realîzmê xistine yek ji wan jî, Anton Çekhov e. Çekhov, di berhemên xwe de ne tenê nakokiyên tînin, her wiha nakokiyên din ên di nava kesayetan de jî nîşan dide. Jiyanê mirovan, pirsgerêkên wan ên hundirîn, bi tîgihîştinek hemdem û realist raxistiye ber çavan. Lîstikên xwe yê bi navê “Îvanov”, “Marti”, “Xalê Vanya”, “Sê Xwîşk”, “Baxçeyê Vîşneyan” û hwd.

Çekov, di cîhanê de nivîskarê lîstikvanîyê herî mezin e ku, hîne nehatiye eşkerekirin. Nivîskar, di hemû lîstikên xwe de li pey mirovê hemdem û gerdûnî ye. Ew, li qehremanan nagere, mirovê zana û pêşketî digere. Di hunera wî de, prensîbên mirov ên edebî û coş û heyecana jiyane, serhildana li hemberî zordestiyê, di mertebeya herî bilinde ye. Di xebata xwe de pir rastîbînî tevgeriyaye. Li gorî Çekov, nabe ku aliyek jiyane were dîtin, ew di wê baweriyê de ye ku, pêwîst e hemû aliyên jiyane werin dîtin. Rastî di kitekitên (detay) jiyane de veşartiyê. Çekov, jiyane weke ku dibîne digre dest. Serê xwe li ser gelek mijaran êşandiyê û di lîstikên wî de jî tînin dîtin. Di tîgihîştina Çekov de, hûmanîzm, evîndariya mirovan, evîndariya xwezayê û zanyarî hebû. Eger were lêkolînkirin, di jiyana Çekov de, gelek xalên bîngêhîn werin dîtin ku ji bo roja îro derbas dibin. Bi kinahî Çekov, tîgihîştinek



hemdem pêş xistiye ku îro em lê digerin.

### 6-Dawiya sedsala 19'an:

Mirov dikare pêvajoya sedsala 19'an taybet piştî 2. Şerê Cîhanê bigre dest, ji ber ku piştî salên 1960-70'an û vir ve guhertinên gelek mezin pêk hatine. Taybet guhertinên civakî, teknoloji, çand û hunerî û zanyarî pêk hatine. Bi tevî van guhertinan, guherîn û veguherînên siyasî tesîrek gelek mezin li ser ronakgeriyê dike. Heta salên 1950-60'an tesîra Îngilîzan û Fransiyan li ser ronakgeriyê hebû. Her çiqas bingeha ronakgeriya qedîm destpêkê li Rojhilata Navîn pêşketî be jî, ji ber dogmayên olî û sîstemên despot ên feodal di cî de ronakgerî hat cemidandin. Pey re pêl da Grekê û Ewropa'yê. Lê, hema hema hemû pêvajoyên çaxa navîn a ronakgeriyê li Ewropa pêşketî ye. Lê pey salên 1960-70'an û vir ve pêvajoya ronakgeriya hemdem, li Amerîka'yê pêş dikeve. Dema borî ya ronakgeriya gerdûnî, tecribeyek gelek mezin ji me cîhaniyan re hişt. Êdî xweşikirina cîhanê di destê me endamên cîhaniyan de ye.

Di heman cîhanê de, ronakgerî ketiye pêvajoyek nû. Ev pêvajo her yek li gorî hêza xwe ya zanyarî dinirxîne û dikeve nava bizavê. Piştî serdema sedsala 19'an û vir de, deng û renek nû, ji huner û hunermendiyê derket. Ev deng û reng çiqas jî aliyê desthilatdaran ve were astengkirin jî, ketiye ser riyek nû. Ev nûjenî ji her alî ve tê nirxandin û nav lê tê kirin. Yanî ji çaxa navîn heta îro gelek pêvajoyên ronakgeriyê derbas bûn, lê serdema dawiya sedsala 19 û 2000'ê ku îro em di navê de dijîn,

gelek kom û beşên ronakgeran û hunermendan derketine, lê terz û xebata wan, têgihîştin û bizava wan jî serdemên (Romantîzm-Naturalîzm û Realîzmê û hwd.) klasîk derbas nakin. Yan jî, di nav eserekê de hemû pêvajoyên ronakgeran tînin dîtin. Weke cewhera pevajoyên borî, ku navê heman pêvajoyê jî kirine **"Postmodern"** pêş ketiye. Ev têgihîştina felsefîk, di dawiya çaryeka sedsala 19'an de ji aliyê J. W. Chapman ve hatiye pêşxistin. Piştî 2. Şerê Cîhanê di nav pêşketina ronakgeriyê de, her tim tê bilêvkirin. Ev têgihîştin di encama sergêjiya sîstemên cîhanê de rû dide. Piştî salên 1970'an û vir ve pêş dikeve. Taybet rola dijberiya li hemberî sosyalbûyînê dileyize ku ji aliyê sermayedaran ve hatiye pêşxistin.

Postmodern tê maneya pêşiya Modernê ango piştî modernê. Li dijî gerdûniyê, dijberî gerdûniyê ye. Postmodern ew têgihîştin e ku, xweperestiyê, tenêbûnê û cudabûnê mezin dike. Her wiha têgihîştinek rûhî ye. Mirov nikare wek têgihîştinek zanyariyê binirxîne. Ji ber ku ti bingehêk wê ya zanyariyê tune ye ku, xwe li ser bilind kiribe. Ne xwediyê hin prensip û rêbazên bingehîn e. Mirov nikare wek ronakgeriyek rast û dirûst bi lêv bike. Têgihîştinek wisa ye ku ti caran xwe ji derveyî xweşbîniyan nabîne û bi kêmasiyên xwe ve jî, xwedî dernakeve. Di danasina Postmodernîzmê de rastî, derew, bedewî, kirêfî tune ye. Di têgihîştinê de zewq û sefaya bêdumahî û bêsinor heye. Her tişt jî bo kêf û şahiya însan e. Rêbazên jiyanê yê mirovahiyê tune ye. Tenê bijartin û tercîh heye. Li gorî heman têgihîştinê nabe tercîh werin rexnekirin nabe tercîh wek

kirêt -bedew, baş-xerab werin nirxandin.

“*Dîrok mirî, paşeroj bêwate*” ya baş jî nirxandina dema “Niha” ye.

Ev têgihîştin ji têgihîştina bûrjûva wek anarşîzm, nihilîzm û reformîzmê afriye. Li gorî Postmodernîzmê, dema borî mirî ye. A paşerojê jî, ji ber ku ew bi xwe najî, wî/wê eleqedar nake. Bi vê helwesta xwe him dîalektîkê red dike, him jî hewldanên mirovan ên afirandinê bêwate dibîne. Mirov dikare vê têgihîştinê wek “Şizofrena Sosyalî” jî bi nav bike. Felsefeya Hemdemiyê (Modernê) zanyariya felsefîk, dîrokê, edebiyat, huner, ehlaq û rastiyekek destnîşan dike. Ji ber vê yekê têgihîştina Postmodernîzmê wek hebûnek dijber a modernîzmê, xwe dide nîşan. Her wiha dîrokê şaristaniyê biçûk dibîne,

“*Îro-niha*” mezin dike. *Di dewsa evqas têgihîştina çewt a postmodernîzmê de, pêwîst e dema şaristanî wek nirxek pîroz were ditin. Dema borî bibe ronahiya paşerojê ku sentezek “do-îro û sibe” were pêşxistin. Ji bo vê yekê xebat, ked ji bo pêşxistina Şaristaniya Demokratîk were zêdekirin.*”

Postmodernîzm, hînê nebûye xwediyê felsefeyek zelal. Lê hînê (2003) di nav lêgerîna nasnameyê de ye. Di bin navê postmodernîzmê de bênasnameyîyê dijî.

Postmodernîzm, di nav berhemên huner de jî, tesîra ronakgeriya demên borî parçe parçe û ji hev veqetandî tên dîtîn. Di nav listikekê de mirov dikare pêvajoyên hemû serdemên ronakgeriyê bibîne. Yanî mirov nikare bibêje çaxek nûjen ku ronakgeriya borî derbas kiriye. Têgihîştina postmodernîzmê tesîrek neyînî jî li

ser siyasetê dike. Bi heman têgihîştinê ve xwe di nava sîstemê de azad dibînin. Postmodernîst, li dijî îdeolojiyan derdikevin. *Lê tê jibîrkirin ku dijderketina îdeolojiyan jî, îdeolojiyeke ku di bin xizmeta sermayedaran de ye.* Lê di raya giştî de dijberiya postmodernîzmê jî pir e. Niha li ser navê wê gotûbêj tê kirin ku nav bi xwe jî şaş e. Yanî têgihîştina piştî modernê gelek bêmane ye. Her wiha etîk a ehlaq tune ye. Bi kinahî nediyariyek ehlaqî ye.

Lê yên bingeha vê têgihîştina postmodernîzmê daniye ku wek etîkek îdeolojîk pêş xistiye, zanyarê Fransî Vean François Lyotrd e. Her wiha nivîskarên wek Danîel Bell (Pirtûka bi navê “Dawiya Îdeolojiyan”), Fukuyama (Pirtûka bi navê “Dawiya Dîrokê”), Huntington (Pirtûkên bi navê “Pevçûna Çandanango Pevçûna Şaristaniyan”) jî bi eserên xwe ve pêşengiya felsefeya postmodernê kirine.

Ev yek nayê wê maneyê ku di heman demê de ti hewldanên nûjen nîn in. Berevajî gelek pêşketinên pîroz hene. Lê bi tevî vê teknolojiyê îmkân û derfetan encamên ku tê xwestin nehatiye bidestxistin. Di warê pêkanîna îmkân û derfetan de ti astengiyek ku mirov derbas neke tune ye. Her wiha hin hewldanên ber bi çav jî hene ku mirov dibîne. Weke minak, di vê pêvajoyê de ku wek ronakgeriya nûjen tê gotûbêjkirin, tesfîrkirina her tiştî esas tê girtin. Yanî mirov dikare di nav listikekê de ji bilî hêza mirovan hêza tebiat, alav, hebûnên bi çav tên dîtîn weke ku ew jî diaxifin tê destnîşankirin. Yanî bi têgihîştina ku her tiştên xwezayê di nav yek sîstemê de bi hev re girêdayî ne. Bi bûyerekek biçûk çî baş çî jî xerab,

ji hev tesîr digrin. Ev yek têgihîştinek nû ye ku, wek xeta parastina ekolojîk, etnolojîk û teknolojiyê xwe dide pêş. Li gorî dema xwe xetek nûjen e. Rizgariya civakê li ser esasê parastina xeta ekolojîk û etnolojîk wê pêk were. Di heman demê de her tişt di nav guherîn û veguherînek xurt de ye. Mirovan bi teknolojiyê serdariya xwe pêş xistiye. Her wiha neçar e ji bo paşerojek birûmet a mirovan, xwezayê û hemû zindiyên gavek nû biavêje. Çaxên borî ji me re gelek dersên fêrbûnê hiştine.

Ev çaxa ku em di navê de ne, bi awayeke hêsan pêş neket. Heta ku ev rewşa îroyîn pêş ket, gelek xerabî-başî, hilweşîn-avakirin, zanîn-nezanîn, hezkirin-nehezî, şev-roj û şer û aşî, gul û azar-kêfxweşî derbas kirin. Bi kinahî di bin vê pireya cîhanê de, gelek av derbas bûn. Mirovan ji avê pirsîne; *“Çima ev qas gum gum û deng ji te tê? Çima ev qerebalix? Gotiye; ji kevirên nava min bipirse.”* Lê kevirê di nava avê de jî mirov bi xwe ne.

Mirov eger bixwaze dikare di vê cîhanê de bêşer, xerakirin, hilweşandin û şewitandinê tev bigere. Ji ber ku mirov bi xwe jî parçeyek ji vê xwezayê ye. Xweza çawa ku di nav sîstemekê de dimeşe, giyana însan jî parçeyek vê gerdûnê ye. Çawa ku sîstemek giyana mirovan a şixulandinê heye, di dema ku parçeyek giyan zerarê dibîne, hemû bi hev re jan digre, gerdûn jî ku mirov di navê de ye, yek sîstem e û dema ku mirov zerarê dide xwezayê, her wiha zerarê dide giyana xwe bi xwe. Bêyî ku haya wî ji vê rastiyê hebe, hêşiran dibarîne.

#### 7- “Hunera xweşaxaftinê”

#### Berhema Pîroz a Pêvajoyên Ronakgeriyê ye:

Serdemên ronakbîriya borî, berhemên gelek pîroz ji civaka îro re hiştine. Pêşketina ronakgeriyê, pêşketina mirovahiyê ye. Mirovahî zanyariya ku îro di navê de ye, li ser têgihîştina ronakgeriyê pêl da. Pêşketina ronakgeriyê rê li ber têgihîştina hemdem a xweşaxaftinê vekiriyê. Bi tevî pêşketina teknolojiyê êdî civak jî, di warê girîngiya xweşaxaftinê de hatiye perwerdekirin. Rêbaz û prensîbên hunera xweşaxaftinê bi rêbazên zanyarî, hatine destnîşankirin. Di encama xebatên zanyarî yên di der barê bikaranîna deng de, çarçoveyek zelal a zanistî hatiye danîn. Di her însanekî de dengê xweş heye. Yanî dengê her mirovekî xweş e. Lê eger dengê xwe nas bike û bikare hunera bikaranîna deng pêk bîne. Sedemên baş û xerab ên bikaranîna dîksiyonê gelek in. Weke tendirûstî, sosyolojîk, psîkolojîk, cografîk û îklîmê hene. Di serî de hişyariya li hemberî tendirûstiyê, zanyariya bikaranîna deng gelek girîng e. Her wiha zanebûna mirovan, mustevaya mirovan a çanda giştî û têgihîştina îdeolojîk hêza bikaranîna dîksiyonê destnîşan dike.

Di dîksiyonê de cureyên dangan hatine tespîtîkirin û di zanîngehan de şagirt tînan perwerdekirin. Hunermend, siyasetmedar, rojnamevan girîngiyek taybet didin hunera xweşaxaftinê. Niha wek prensîbek bingeşîna pêwîstiya jîyanê, ku her kesê xwediyê zanebûna çandê ye, dixwaze dîksiyona xwe baş bike. Taybet li welatên rojava di hemû dibistanan de,

dersên xweşaxaftinê tên dayîn. Ji zarokatiyê û vir de kesayet tê perwerdekirin. Sedemên bingehîn ên başî û xerabiya deng hatiye tespîtîkirin û ka çawa mirov dengê xwe baş bi kar bîne didin fêmkirin. Ji bilî xwendina dibistan û zanîngehan, di konservatuar û qursên demsalî de jî derfetên xwe perwerdekirinê hatine pêşxistin. Girîngiya xweşaxaftinê ya di nava civakê de, wek pêwîstiyek jiyanê xwe li ser mirovan ferz dike. Naskirina deng, naskirina kesayet e. Kesayet bi xweşik ango nexweşik axaftinê ve tê naskirin. Pêwendiyên mirovan ên xweşbîn, li ser gotinên xweş û baş sererast dibe. Çawa ku mirovan bi “Dijunekê” dest bi kuştina hev û din kiriye, dikare bi gotinên xweş ve jî, rê li ber kuştinan bigre. Eger Mirov bixwazin dikare zimanê aşî biratî û wekhevîyê bike prensîba jiyanê. Li welatên rojava her siyasetmedarek di perwerdeya xweşaxaftinê de derbas dibe. Gelek wezîrên dewletan çawa ku kete parlamenê demekê çû perwerdeya dîksiyonê. Ji ber ku pêwîst e baş were zanîn ku siyaset bi xîtabetê tê qezenckirin. Eger dîksiyon baş were bikaranîn, dikare tesîr li ser civakê bike û hêza xwe ya îdeolojîk bi bikaranîna xîtabetek baş belav bike. Her mirovek xwediyê çend cureyên dangan e. Ka kîjan dengî çawa, bi kar bîne tê destnîşankirin.

#### **a- Di xweşaxaftinê de cureyên dangan:**

Her mirovek xwediyê sê cureyên bingehîn ên dangan e. Yanî mirovek dikare sê dangan ji devê xwe derxîne. Ka kîjan deng li gorî kîjan mijarê be fêmkirî. Kesek ku dengê xwe nas neke, wê nekarîbe di danûstandina mirovan de tesîr bike. Bikaranîna deng li gorî mijarê tê

guhertin.

**a-Dengê Sing:** Weke navê xwe jî diyar e, ew deng e ku ji sing dertê. Bi vî dengî mirov dikare di berhemên edebî, çandî, xemgînî, cografî û hwd. de, bi kar bîne. Lê li gorî naverokê tê guhertin. Wek mînak helbestek, rojane û ajîte-dirûşme be, nabe dengê sing were bikaranîn. Gelên wek Kurd, Fars, Fransî taybet di jiyana rojane ya xwezayî de, dengê sing bi kar tînin. Sedemê vê yekê jî, tesîra çanda dîrokî ya li ser ziman e.

*Nimûne:*

*Xwezî ez li ser xaka niştîman frikek genim bama,*

*xwezî frikek genim bama*

*daku karkerekê ez dirûtibama*

*û*

*diyarî aşvanekê bikiribama*

*Aşvan, ez bixistibama nav duçerxa beraş*

*û*

*bihêra*

*Dayikek Asurî ew ar bikira nanek tenûrê*

*û*

*diyarî zarokek birçî ya li ser xaka Mezopotamya bikira.*

**b-Dengê Qirikê:** Taybet civakên Semîtîk bi kar tînin. Xwendina Qur-anê û telafuzkirina wê, bi dengê qirikê tê bikaranîn. Ayînên olî û hunera opera dengê qirikê tê bikaranîn. Di ola xiristiyanan, ola misilmanan û opera (ku ew jî berhemek dêrê ye) de, heman deng tê bikaranîn. Her wiha mirov dikare wek “Zimanê Sahrayê” jî bi nav bike. Zimanê Erebbî, lugata Qur-anê ye

û berhemek civakê ya sahraya Erebiyanê ye. Lê li Ewropa welatê ku wek sahra tê qebûl kirin Hollanda ye. Di nav zimanên Ewropa de, zimanê Hollandî (Flemani) jî qirikê tê peyivîn. Yanî bi van mînakane diyar e ku cografya jî tesîrek mezin li ser ziman û bikaranîna deng dike. Her wiha dengê qirikê wek dengê bangawaziya xwezayê jî tê qebûl kirin.

*Nimûne: Ayetên Qur-anê. Muzîka Opera.*

**c-Dengê Ser:** Ev cureya deng, taybet di zimanê ajîtê de tê bikaranîn. Siyasetmedar, bi dengê ser xîtabî girseyên gel dikin. “Zimanek Pratîk û Rojane” ye. Eger mirov bixwaze di nav demek kin de tesîr li ser civakê bike û bixwe nava tevgerê, dikare heman dengî bi kar bîne. Zimanê Almanî, Tirkî zimanek pratîk e. Ji ber ku zimanê şer e. Herdu civak jî, di bin tesîra serdema barbariyê de ne. Her tim şer kirine. Di tafuzkirinê de, militarîzm heye. Lê bandora vê cureya deng demborî ye. Tesîrek demdirêj li ser civakek pêşketî nake.

*Nimûne:*

*Hemwelatîyên heja,*

*Sîstema dewleta Tirk, zulmek mezin li ser we dimeşîne. We ev zordestî, heq nekiriye. Her roj we dikujin. Zarokên we direvînin. Êşkence, li zarokên we dikin. Hun ber xwe bidin. Zimanê we, navên Kurdî qedexe ye. Çanda we tê asîmîlekirin. Dîroka we dîroka herî kevn e. Niha dixwazin vê dîrokê tune bikin. Emê bi hev re, rîya berxwedanê berdewam bikin. Hun serê xwe li hemberî sîstema zordest netewînin. Berxwedan jîyan e.*

Her wiha nûçeyên rojane, pêwîst e bi dengê ser were xwendin. Eger bûyereke xemgîn û

dramatîk be dengê sing, eger ayînek olî be, dengê qirikê, bibandor dibe. Ji aliyê din ve gelên bindest, jî ber ku hatine perçiqandin û rastî zordestiyê hatine, zimanek xerab bi kar tîne. Mirov dikare wek “Zimanê Kole” jî bi nav bike. Diranên xwe ranake, devê xwe venake û dipeyive. Her wiha hin deng jî, di bin difna xwe de derdixe. Sedemên van dangan, psîkolojî û tendirûstî ya xerab e.

**b-Bizavên ku deng xêra dikin û baş dikin:**

Di her mirovekê de tîlên dangan hene. Di dema ku ev tîlene xera dibin, dengê mirov jî ji xwe xera dibe. Sedema xerabûna deng çi ye? Çima dengê mirovan dikeve, xera dibe? Gelek sedemên xerabûna deng hene. Di serî de, nezani. Kesayetê/a li hemberî xwe ne hişyar be, wê bi awayê xwezayî zerarê bide dengê xwe. Ji xwarinê bigre heya xewê, rabûn, rûniştandin axifin û meşînê, hin bizavên şaş, zerarê didin deng.

**1-Xwarin û Vexwarin:** Sedemek bingeîn ku zerarê dide deng, hin cureyên xwarinê ne. Xwarina bêsîstem, deng xera dike. Her wiha tûj, dijwar, tirş, vexwarinên bikepek, xwarinên pir bibaharat, xwarina gelek hişk ango ziwa, cigare, hewayê qirêj zerarek mezin dide deng. Her wiha xwarin û vexwarina kel, tîlên deng diderizîne. Di dema ku mirov xwarinê dixwe, dadiqurtîna pariyên mezin ne baş e. Qirika mirov xera dike, tîlên deng zerar dibîne û ev yek jî, rê li ber dîksiyonek xerab vedike. Akorda deng zerarek mezin dibîne.

**2-Bizavên Giyan:** Xalek ku zerarê dide deng, bizavên giyan in. Di dema ku mirov

seranser serê xwe bizivirine stûyê mirov zerarê dibîne. Her wiha ev yek tesîrek negatîf li ser deng dike. Her wiha bizavên sporê, eger bi awayeke hişyar neyên çêkirin, deng zerarek mezin dibîne. Taybet stûyê mirovan, damar û tîlên deng gelek nazik in, bi bizavên nedicî de, zerarê dibîbin. Ji ber vê yekê eger kesayetêk bixwaze bibe xwediyê xweşaxaftinê neçar e her roj sporek sivik bike û dema sporê dike jî, bizavên ku zerarê dide deng pêk neyîne. Her wiha di dema ku yek car hewa dikşîne qirikê zerar digihîje tîlên deng. Ji ber vê yekê danûstandina hewayê gelek girîng e ku mirov dîqet bike. Her wiha dema razan û hişyariya serê sibehê neçar e bi tedbîr tev bigere. Yanî seranser raneze, ciyê serê xwe datîne (balgî) baş be. Ne gelek bilind, ne jî gelek nizim. Dema ji xewê jî radibe seranser nabe. Pêwîst e ku mirov carekê de ranebe. Hêdî hêdî weke şemaya li jêr hatiye destnîşankirin, pêwîst e ji xewê rabe ser xwe.

#### ŞEMA:

- 1-Di serî de, xwe wergerîne ser devî.
- 2-Destê xwe yê rastê, pişt re yê çepê bide ber xwe.
- 3-Pişt re pê rastê û pey re jî, yê çepê.
- 4-Hêdî hêdî radibe ser xwe.
- 5-Di serî de piyên xwe, pey re destên xwe, pey destan milên xwe û herî dawî jî, serê xwe

radikî û xwe bi giştî rast dikî.

Dengê her mirovekê, bi awayeke (Eger nexweşî tune be) xwezayî xweş e. Tenê tişteke heye ku mirov bi kar nayinin, ew jî terbiyekirina deng e. Dengxweşî ango dîksiyonek baş, bi terbiyekirina deng ve mimkun e. Bi tevî zanebûna kesayet, eger mirov dengê xwe bizane terbiye bike, dikare dengek xweş, gotinên xweşik ji devê xwe derxîne. Di terbiyekirina deng de, zanebûn û spor, rolek gelek girîng dileyizin. Taybet zanebûna di der barê xwarinê de.

Di dema ku mirov xwarinê dixwe, pêwîst e hêdî hêdî bixwe. Hin cureyên xwarinê hene ku hêza tîlên deng baş dike. Weke xwarina kêmbon-rûn. Her wiha hêka xav ji bo deng baş e. Kesê ku dixwaze dengê xwe baş bike, neçar e donê (wek donê zeytê) sivik, bi kar bîne. Her wiha beriya axaftin û xîtabetê, ne baş e ku mirov şîrnahiyê bixwe. Her wiha beriya çalakiya bikaranîna deng (wek stran gotinê, xîtabet kirinê, nûçe xwendinê û hwd.) ne baş e mirov gelek xwarinê bixwe. Heta ji bo bikaranîna diyaframê, nîvbirçîbûn gelek baş e. Beriya çalakiyê, nabe ku fêkiyê wek pirteqalê were xwarinê. Her wiha xwarina hişk wek guz, findiq, fistic, biskuvî û hwd. dikeve nav diranan û hêza axaftinê dişkîne. Taybet şîrnahî, rihet tevgerîna ziman asteng dike. Di encamê de, terbiyekirina deng bingeha xweşaxaftinê ye.

## Pirtûkxana Kawa

# Destpêkên Peydabûna Hesta Netewayetî Kurdî di Mêjoya Nû de

## Amadekirin: Besam Mistefa

### Pêşgotinek:

Hebûna milletê Kurd di wan deveran de yên ku mêjû behs lê diket di zivrêteve bo serdemên dêrîn û kevin, û bi gelek navan dihate niyasîn, milletê Kurd bi hebûna xwe wekû komeke siruştî ji mirovan bi peywenda hevpişkî û yekbûna axê û bineret û ziman û dab û nerîtan pêkve dihate girêdan, belê hesta netewayetî, û hebûna mercên hevbendiya netewayetî a li dev wan peyda nebû taku sedê nozdê, destpêka hestkirina bi nasnama netewayetî û bizav ji bo bicih ênana wê yekem car li dev torevan û hozanvanan peyda bûye, paşê di nav jîngeh û dorhelên mîrên Kurdan de belav bûye, ewejî ji ber egerên mêjûyî û siyasî û zanîne, lê gelê Kurd bi şeweyekî giştî ketibû li jêr kartêkirina ayinê, sererayê vê Çendê ji layengeriya bizavên serxwebûna neteweyî yan yên navxweyî kiriye ewên mîrên Kurdan pê rabûyin yan şêx û ayindarên xudan desthelat, ji ber ku van bizavan hest bi arîşên wan dikir.

Sererayê hindê ku ev bi sedan sal e milletê Kurd şiyaye welatê xwe û ziman û keltûre xwe

bi parêzit; lê hindek egerên mêjûyî û şaristanî ser bi wan û niştimanê wan de girt, û bûne egerên nepeydabûna ci kiyânên taybet bi wan ve, angu Kurd şiyân hebûna xwe bi parêzin wekû gel, lê bê dewlet.

Ev vekoline hewil didet ku dûvçûnê biket li destpêk û pêşhatî berejengên hestkirina Kurdan bi nasnama xwe ya netewayetî, û veguhastin û guherîna van pêşhatiyên destpêkî bo peydebûna hesta netewayetî, û hewildanên milletê Kurd ji bo bicih ênana nasnama xwe ewejî bi damezirandina dewleta xwe, dîsan ev vekoline egerên paşveman û gêrûbûna hişyariya astenga û role xirap e wan dewletên desthelat li ser Kurdistanê kirin yan di navbera xwe de dabeşkirî taku rûydana cenga cihanê ya yekem li sala 1914 an de.

\*

Pirtûka birêz Dr. Ebdilfetah Eli Botani, mamoste li kolêja wêjeyan – zankoya Dihok – "Destpêkên Peydabûna Hesta Netewayetî Kurdî

di mêjûya Nû de " , a ku cara didwan tete capkirin , di sala 2005an de li Kurdistana azad de , ev tiştê ku nirxa kitêbê û naveroka we ya zengîn dide aşkerekirin- li ser neh birran tê parve kirin .

Bi rastî, min pêşgotina xwe ji pirtûkê bi xwe wergirt, tenê min ew wergerand ji tipên Erebi ber bi Latinî ve û min jê şayistetir ne dît ku wekû pêşgotinekê, ji vê lêkolîna xwe re, binosim. Naveroka kitêba Dr. Botanî van babetan hembêz dike:

- Diyarî
- Despêkên peydabûna hesta neteweyetî Kurdî li mêjûya nû de.
- Berejengên hestbûn û bîreweriya bi nasnama Kurdî li Kurdistanê
- Bizava peydebûna hastên neteweyî Kurdî
- Sedemên paşvemayîna hastên neteweyî Kurdî.
- Despêkên peydebûna hesta neteweyetî Kurdî di mêjûya nû de (bi Kurdî, ewa ku me weke pêşgotinekê ji vê nivîsa xwe re danî û di pêşî de hat).
- The beginnings of Kurdish National consciousness in modern history (ayni ew pêşgotin bi zimanê Ingilîzî).
- Jêder û lêveger û tîbînî.

\*

Diyarî

**Dr. Botanî vê pirtûka xwe diyarî van kesan diket:**

- Ji bo her Kurdekî ku ji dil û can baweriya xwe tîne ku ew berî her tiştî Kurd e, û zane ku bêhêvibûn jiyane dikuje!

- Ji bo canê hozanvan û filzofê Kurdî mezin Ehmedê Xanî ( 1650-1707) yê ku damezirandina kiyaneke neteweyî Kurdî serbixwe mîna berdehamî û temamkirinekê ji baweriya xwe ya olî re didit û wiha digot:

Bera me heba dewleta serbixwe

Li ser me hakim bin bi xwe

\* \* \*

Eger me hebûya itifaqek

Vêkra bikira inqiyadek

Me dê din û dunya bi qezenc dikir.

\*

**Despêke peydabûna hesta neteweyetî Kurdî di mêjûya nû de**

**Pêşgotinek:**

Dr. Botanî di despêka vî birî de dibêje ku: ne hêsan e ku em ji dîrokeka taybet destpê bikin , yan em bûyereke dîrokî serbixwe wekû qunaxeke pêşekî hîlbijêrin , yan taku xaleke guhorinokî di peydebûna hesta welatperwerî û neteweyetî Kurdî bi wateya xwe ya nûjen û modern jî , lê eger em li rûpelên dîrokê vegerin em dê bibînin ku hestbûna bi girêdan anjî hacisê Kurdayetiyê ve, ji mêj ve ye ku li Kurdistanê hebûye, angu Kurdan hebûna xwe ya neteweyî bi bîr dibirin li gor nerîn û formên wan deman , ji ber ku erda ew li serê dijiyan erdeke Kurd bû , û ziman ; zimanê Kurdî bûye ,



û mêtûya wan mêtûya Kurdan bûye , tevî xurista pîrnsipên civakî û folklorê gelêrî û konseptên ramanî û pisikolojiya wan ku bi tevahî Kurd bûn . Ev hest hebû beriya hebûna Netewayetî wekû felsefeyeke li ser stûn in taybet û serekî ava dibe, wisa; ra yê hestbûna bi girêdana neteweyî ve xwe kûr berdabûn nava mirovê Kurd de bi behaneye ku ev gel, û ji berbanga dîrokê ve di gelî, Çiya û deştên xwe de, kokên xwe yê netewayetiyê parastine û zimanê xwe sax û zindî hiştine û bihtîrîn kiyaneyên xwe li ser bîngeheke neteweyî damezranidine.

Di ve derbarê de, gelek nûser û dîroknas di riya lêkolîn û vekolînan de, gihştine rastiyêke pîr giring: Gelê Kurd, berevajî gelek milletên din ku neman e yan li ber nemanê ne, hemî hewildanên tunekirinê derbaz Kirin e û mane. (1)

Dr. Botanî di riya gelek jêderan de vê meselê hîn bêtir şirove dike: dîroknasê Ermenî Seferstiyan di vê derbarê de dibêje ku: " Di dema niha de ti millet nîn e bi navê Hisiyan, anji 'Eylamiyan û neji Seb' iyan; lê heta roja îro jî hîn gelek heye bi navê – Kurd – li ser heman devera jografî a ku Kurdên kişwera Kotiyan lê dijîyan beriya Çar hezar sal....." (2)

Almecirson jî derheqê milletê Kurd de wiha dibêje: " Kurd ji milletên Rojavayê Asiyayê ne ku xwe li hember hemî artêşan girtine û paqijîya zimanê xwe parastine û (bi serbilindî gotine ku ew in Ariyên xuru, daniştîyên giran û xwediyên ziman) " (3).Gelek lêkolînan û zaniyarên dîtir jî heman nerîne dipejirînin weke: Dr. Şakir Xesbak (4), Mînoriski (5),

Lirêx (6), û Driver (7).

Niborê Gerok jî, ji aliyê xwe ve, dibêje ku sedemê parastina Kurdan bo zimanê xwe ku koka netewayetiyê ye; ji ber wê yekê ye ku ew hertim ji layê serokên xwe ve hatine deselatkirin. (8). Tevî ku paşvegerana Kurdan a xwezayî ber bi Çiyayan ve ji bo xwe ji tunekirin û qirkirinê bi parêzin , yan ne helin û neyêne pişafîn di wan demên hovane de ku şerê hebûn û nebûnê li dar bû û tenê yê bihêz dijîyan (9) , hişt ku Kurd biminin û zimanê xwe yê neteweyî bi parêzin .

#### **Berejengên Hestbûn û bîrbirina bi nasnama netewayatî Kurdî li Kurdistanê:**

Tevî ku sedsala Nozdehan tê jimartin wekû despêka hizra Neteweyî li Ewropa, lê ev hizr û ramanên neteweyî berî vê demê jî li gel hindêk nivîskar û wêjevanên Kurd hebûn. Dr. Botanî xaleke pîr giring di vî warî de aşkere dike , eweji ev e ku hest û ramanen neteweyî û welatparêzi Kurdî pêşi li cem torevan û hozanvanan hate holê berevajî netewe û milletên ditir ku ev tişt li ser destê ramanvan ve ce dibû . Wekû minak hozanvanê Kurd Babarexê Hemedanî yê ku di sala 841e de wefat kiriye , ku di hozaneke xwe ( bi zimanê Kurdi ) de gazi milletê xwe dike da weku şêran herine şer û zora neyarên xwe bibin daku welatê wan bibe cejin û rojên wan xweş û geş bibin .Paşê, Baba Tahirê Hemedani ( ' Ureyan ) ji ( 935-1010) vê hizrê bilind dinirxine û welatê xwe bi gulekê dişbine ku wi ew av daye û hay jê maye , vêce cawa xeyni wi were û bihna wê ji xwe re bibe ! (10). Di serdema hukmê Islamê de jî, ev hesta neteweyî li bal Kurdan hebûye bi

behaneye ku paşnavên gelek zaniyarên Kurd bi (el-Kurdi) dihatin nişan Kirin, ji layeki ditir ve ji Selahedinê Eyûbi (1137-1193) arteşa xwe bi Kurdan bi hêz dikir û jiyaneke serbixwe û payebilind dijiyan, û heta îro jî li Şamê paytexta Sûryiye (Taxa Kurdan) bi nav û deng e. Derbarê peyva " Kurdistan " , mamoste Botanî dibêje ku di nîvê sedsala sezdehan de hate xuya kirin li gor dirokasê Mexulî Reşîdedîn Fadululahê Hemedanî (1318e de koc kiriye ) ev nav (Kurdistan ) têt bi wateya devera cografi a ku Kurd lê dijîn . (11) Paş sedsala 15an , Mele Husenê Bateyi (1414-1495) , " Mewlûda Kurmanci " bi zimanê Kurdî ce dike , eweji dide xuya kirin ku hesta neteweyi hêdi hedi rengê xwe yê taybet werdigirt .

Nivîs û hozanên Hemedani, Bateyi û Heriri giringiyeke xwe ya berz hene

Ji ber ku hate nasîn ku mirov dikare bi zimanê Kurdi binivîse û taku pirtûkên oli-ayini jî û ti gunihi nin e, wisa wan diviya ku ast û radeya hesta neteweyî Kurdi bilind bikin û bi cespînin.

Di sala 1514an de, cewşena Çalderanê ku di navbera Safawî û Osmanîyan de rûda , welate Kurdan , Kurdistana rengin ji bo cara eke hate parçe kirin.....le li diji zordari û sitema dagirkeran Kurdan li berxwe da û tişte ku ve gotine tekuz û dupate dike di raman û berhemên van helbestvan û nûseran de aşkere dibit : Şerefxane Bedlîsi ( 1543-1602) – Melaye Ciziri ( 1570-1640 ) , Eli Termaxî , Feqiyê Teyran ( 1590-1660 ) û Ehmedê Xani ( 1650-1707 )

Şerefxanê Bedlîsi , e ku jib o hesta xwe a neteweyi , dev ji xweşi û deskeften deselate berdabû , di Şerefnama xwe de dibêje ku : " Tucari Kurdistan bindest nabe û qet we Kurd sere xwe ji tukesi re ne tewinin ! " .

Weku ku me li jor ji goti, ku hizr û bira neteweyi Kurdi li gel hozanvan û torevanan despe kir: Melaye Ciziri xwe di helbesteke xwe de wiha did nasin:

Gula Baxê Irema buhtan im

Şeb ciuraxê şebe Kurdistan im

Mele, û jib o ku zimane Kurdi bi xelke şerin bike di devereke di de dibêje:

Ger lu' lu ye mensûr ji nezme tu dixwazi

Wer şîire (Mele) bin te bi Şirazi ci hacet!

Feqe Teyran jî, nûsere dastana " Sexe Sen'ani ", gazi gel dike jib o ser daku welate bav û kalan rizgar bibit:

Ezê bejme cem'eta xwe de

Bes e bikşinin nire zulmkara

Hetani kengi eze bejim ewa

Qelem ji hilyayi di deste min de

Eze herim nava Kurda

Eze wan re bistrem azaye

Eve gotina min heta hetaye (12).

Helbestvan Bekir Begê Erzi, biraye mire kelata Erze û neviye malbata mireken Amediye pesine xwe bi nijade xwe e Kurd dide û dibêje:

Bekir Begê Erzi me

Ji mezheb ê (Saff'i) me

B'(esl) ê xwe Kurdi me

(We'ze) ê meji bi feyde ye

Ji xwe Ehmede Xani mire helbestvanan,

yekta bûye di vi biwari de .Ewi "MemûZina"  
xwe bi zimane Kurdi hûna:

Da xelq nebejtin ku Ekrad

Be me' rifet in be esl û binyad

Di "MemûZin" de, Xani problema Kurdan ,  
angu " BETIFAQIYA" wan askere dike û dide  
xuyani kirin ku pewiste di bin siya hakimeki  
Kurd de ew tev bigerin, ji ber ku eger yekiti  
tune be , dewlet j ice nabe !! Guhbidêr in  
seydaye mezin ci ji me re dibêje:

Ger dê hebûya me padisahek

Layiq bidiya xwede kulahek

Te'iyin bibûya jib o wi textek

Zahir vedibû jib o me bextek

Hasil bibûya jib o wi tacek

Elbette dibû me ji rewacek

Xemxwari dikir li me yetiman

Tênane dere ji dest le'iman

Li vir , em dikarin bi serfîrazi mina nûser  
Me'sud Mihemmed bibêjin , ku teqezkirina  
Xani li ser yekitiya neteweyi Kurdî beri  
sedsaleke ji Şoresa Firensi (1789) ku bû  
despeke milletbûn û dewleta neteweyi , tekûz  
dike ku Xani mamostayê yekemin e û bê hempa  
ye di warê netewayetiye de !

#### **Bizava Peydabûna Hestên Neteweyî Kurdî:**

Weke me berê jî got, Şoreşa Firensî a ku di  
sedsala hijdehan de ( 1789) rabû , bû despêka  
hizra neteweyî li Ewropa , û tevî ku Kurd di  
navbera herdû deselatên sitemkar û zorbaz de  
bûn – Tirk û Firs - , lê slogan û durişmên  
Şoreşa Firensî cihên xwe di nêv mîrekên  
Kurdan de girtin lê cemawer ji wan durişm û

prinsipan dîr man !

Bê guman e ku hest û hizra neteweyî pêşî di  
nav elitan de peyde bû , angu li gel serokan ji  
ber vê cendê jî tevahiya serhildan û raperinên  
ku li Kurdistanê vêketin di nivê pêşîn ji  
babeliska Nozdan de, bi destê wan bûn wek :  
Ebdilrehman Paşayê Babanî, Mihemmed  
Paşayê Sorani , Bedirxan Paşayê Botani  
.....hwd .

Ji pêvî mîrekan jî, şêx û olperestên Kurdan  
jî roleke neteweyî leyztin, bi taybetî paş ku  
rewşa Kurdan xirap bû û Kurdistan kete bin  
destê dijminan. Baştirîn mînak ji boyî vê babetê  
Şêx 'U beydellahê Nehrî ye (1831-1900), ê ku  
di salên 1879-1880 şoreşek vêxist bi navê  
netewayetiye û armanca xwe weke yekkirina  
Kurdan di nava dewlteke Kurdî serbixwe de,  
ilan kir; ewe jî cara yekem bû ku hizra neteweyî  
Kurdî dihate niqaşkirin.

Bê guman her û her ev ramana netewayetiye  
bere pêş ve dicû û bi zayina rojnamegeriya  
Kurdî re (rojname Kurdistan) re di 22 Nisana  
1898an ku bû piştgir ji pêşxistina bizava  
neteweyî Kurdî re û lay û hêviyên ramanî û  
ramiyarî yên mirovên ku di tevgera hişyarkirina  
hizra neteweyî Kurd de kar dikirin anîne holê û  
bi dercûna vê rojnamê re, pêvajoyeka nû û  
taze di dîroka peydebûna hizr û bîra neteweyî  
Kurdî de despê kird , ev jî ji navê rojnamê bi  
xwe diyar û 'eyan dibû: Kurdistan!

#### **Sedemên Paşvemayîna Hestên Neteweyî Kurdî**

Dr. Botanî di vî birrî de dibêje ku sedemên  
herf gewre ji paşketina hizra neteweyî Kurd re  
ev in: Ola Islamê! Ne ji ber ku oleke xirap û ne

baş e lê ji ber ku her û her hatiye bikaranîn ji boyî armanc ên ne baş û xirap!!Ereb , Firs û Tirk – bi navê Islamê sitem û zordariya xwe li Kurdan kirin û dane meşandin , û tevî ku Islam ayineke cihanî ye , Ereban ( helbet ne hemî ) mane nijadperest û qet wekheviya gel û milletên din ne pijirandin ( Mewali !!!) . Pir zulm û te' de li zimanê Kurdî jî di vî warî de , hat ji ber ku Qurana pîroz bi zimanekî Erebi" fesih " daketibû êdî herkesî ew mîna zimanekî pêşeng û pîroz didît . Ev bû sedema ku Şêxekî weke şêx Ma'ruf ê Nodehî ê Berzencî (1757-1838) dor (46) pirtûkan bi zimanê Erebi û Farisî jî binose ta ku yeka tenha û picûk bi Kurdî ceke!! Şex Ma'ruf dibêje ku:

Elhemdûlilahî 'ela ma weheb  
Hedana îla lîsanu el- Erebi

#### Angu:

Şukir ji Xwedê re li ser tiştê ku bi me de  
Derfet da ku em hînî zimanê Erebi bibin

Helbet Şêx Ma'ruf ne ê tenê bû di vî warî de û Faris, Tirk û Ereben misliman ev tişt hîn pitir xurt kirin û di hiş û mêjiyan de Çandin û mamoste Botanî gelek mînakan ku vî tiştî, angu dijminahiya wan ji Kurd û zimanê Kurdî re teqeze dike, di pirtûka xwe de rêz dike, û van nerînên şaş û cewt ku gelek Kurdan kiriribûn hişt ku bandore xwe li hestên neteweyî Kurdî li paş bimînin li hember milletên cînar yên ku berjewendiyên xwe yên neteweyî bi dest dixistin bi navê Islamê!!

Vêce hebûna Kurdan di navber hêzên dewletên neteweyî (Firs, Erebi û Tirk) de ku

xwedî dîrokeke siyasî û kultûreke bi bandor in, ne tenê kir ku peydebûna hestên neteweyî Kurdî paş bikevin, lê roleke xwe ya negatîve jî li ser bizava Kurdî a neteweyî rizgarîxwaz jî kir, û nehişt ew ber bigire û ev qelsbûna bingehînî dîrokî di laşê neteweya Kurd de û tevgera Kurdî a siyasî, ku heta niho jî tê xuya kirin di neyekserbûna neteweyî û parcebûna siyasî û cografî de!

Tevî van hoyan hemiyar jî ku hesta ciwaziya ji gelên din û bi nasnama serbixwe jî, tevgerên Kurd li Kurdistanê di nîvê pêşin ji sedsala Nozda de , bi rengên welatperwerî û neteweyetî xemilandî bûn û bi hestên neteweyî ku pêşî di nav mîrekên Kurdan de belav bû . Ji boyî piraniya Kurdan jî – ku di bin kartêkirina ayinî de mabûn- piştgirîya xwe bi serokên wan bizav û tevgeran dianîn ji ber ku van bizavan hest bi arîşên wan dikir tev li hebûna bizavên veşartî ku bi dizî û eşkere , kar dikir bo bicih ênana nasnama neteweyî Kurdî .

Di dawiyê de, tiştê balkêş ewe ku hesta neteweyetî, li nik piraniya milletê Kurd, hêj negoriye bo bîrbirineke neteweyetî, helbet hest tişteke û bîrbirin tişteki ditir e jê cuda ye, ev pirsgerêke ku ji kêmasiyet civaka Kurd tête hejmartin taku Kurd, li hin parçeyên Kurdistanê, negihane ti radeya bîrbirina neteweyî, angu ji ber Çi Kurd rastî şerê cihanê ê yekem hatin û ew parçe parçe bûn, bê serkirdayetiyeke anjî armanceke hevbeş û yekbûyî li ser carenûsa ewan?

Bi vê pirsê, mamoste Botanî pirtûka xwe vekirî dihêle: daku nifşên me yên nû bersivê bidin û dupate bikin ku "kes nebê Kurd dimirin,

Kurd jîn dibin, jîn dibe qet nakevê ala Kurdan  
"!

(1) – Kerim Bafistani" Hindek pirsên  
rewşenbîrî di guftûgoyê de, di rabirdû û dema  
niho de, dîtinek rexneyî" Kovara, Aciras – a  
demsalî serbixwe ku bi Raman, wêje û Çandê  
ve têkildar e, hejmeta (4-5), Bêrût, zivisatana  
1996 an, r: 24.

(2) Ji pirtûka Dr. Şakir Xesbak " Kurd:  
lêkolîneke etnografi û jografî " (Baxda, 1972) r:  
435an, hatiye wergertin.

(3) Vegere li pirtûka wî: Gera  
xweşartiyekî berve Mesopotamiya û  
Kurdistanê ve, wegerandina Fû 'ad Cemîl, c: 2  
(Baxda, 1971) r: 148.

(4) Vegere li pirtûka wî: Kurd û pirsgerêka  
Kurdî, capa diwem (Bêrût, 1989) r: 9-21.

(5) Vegere li pirtûka wî, Kurd: dîtî û  
têbînî, hatiye wergerandin ji Rûsî ji layê Dr.  
Ma' ruf Xeznedar (Baxda, 1968), r: 21-23.

(6) Vegere li pirtûka wî: lêkolîn li ser  
Kurda û pêşiyên wan Xaldiyên Bakur, hatiye

wergerandin ji Rûsî ji layê Dr. Ebdi Haci  
(Heleb, 1992), r: 8-10.

(7) Vegere li pirtûka wî: Kurd di jêderên  
Kevin de, ji Ingilizi hatiye wergerandin ji layê  
Fû'ad Heme Reşid (Baxda, 1986).

(8)- Karstin Nibor, Gera Nibor bo Iraqê di  
sedsala Hijdan de , ji Almanî hatiye  
wegerandina ji layê Dr. Mehmud Hisen Emin ,  
bi veditina Salim Alûsî ( Baxda, 1965 ) r: 74.

(9)- Li ser vê mijarê tu dikare li Xisro  
Goran vegere: Kurdistan di demên dirokê de,  
c.1, serdemên Kevin (100 hezar sal BZ-400Z),  
(Stokholm, 1992).

(10) – Kendî, jêdera berê, r: 13-14, Izedin  
Mistefa Resul, Riyalizim di wêjeya Kurdi de, r:  
57.

(11) – Dr.Zîrar Sadiq Tewfîq, Kurdistan di  
sedsala heştê a kocî de, xwendinek li ser  
mêjûya wê a siyasi û abori , (Hewler,2001) .

(12) – Izedin Mistefa Resul, Şiirê Kurdi,  
jiyan û berhemê şairan beşê yekem: Feqê  
Teyran, Eli Berdsani, Bextiyar Zewer, (Baxda,  
1980) r: 43.